Mirî Ranazin

*Mirî Ranazin*
Helîm YÛSIV

Weşanên Peywend: 4
Edîtorê Kitêbê: Dawud Rêbiwar
Redaksiyon: Peywend
Berg: Aysel KAZICI
Rûpelsazî: Peywend

Sertifika No: 28947
ISBN: 978-605-64331-2-2

Çapa Yekem: Avesta, 1996, Stenbol
Çapa Duyem: Peywend, Payîz 2013, Stenbol
© Weşanên Peywend

Çap:
Kayhan Matbaacılık
Davutpaşa Cad. Güven San. Sit.
C Blok No: 244 Topkapı / İstanbul
0212 576 00 66

PEYWEND
Kuloğlu Mah. Sadri Alışık Sk.
No: 16/50 Beyoğlu İSTANBUL
Tel: 0532 176 93 64

# Mirî Ranazin

Helîm YÛSIV

PEYWEND

KURTE DANASÎNEKE NIVÎSKAR-AAAAAAaaaaa

## NAVEROK


MIRÎ XWEŞIK IN ........ 09

Guhê Jêkirî ........ 09

Ava Şîn ........ 15

Bêhna Qedexe ........ 21

Gula Omeriyan Têlo ........ 25

Keldûman ........ 32

MIRÎ RANAZIN ........ 41

Li Şermola ........ 41

Reşikê Şevê ........ 43

Dilê Bêderî ........ 53

Komara Dînan ........ 59

Çîroka Dawî ........ 84

Ji bo Apê Mûsa Anter

Tê bîra te,

ew dara ku te li hewşa xwe çandibû, va ye..

di ser dîwaran re, şaxên wê gihiştine hewşa me jî li Amûdê.

## MIRÎ XWEŞIK IN

**Guhê Jêkirî**

Kêlîka ku ket derî, devê diya wî bi gazekê ji hev vebû:

-Lawo kanî guhê te Remo... Rebeno?!

Bi dengê diya wî re destê wî dirêjî cênîka wî bû. Tiliyên wî li şûna guhê wî yê çepê vala çûn û hatin. Remo veciniqî. Çavên wî çûn nava serê wî. Diya wî bi her du piyên wî girt. Bi çavên mişt pirs li dewsa guhê windayî nerî. Serê wî zîvirand. Guhê rastê di cih de bû lê hinekî sor bûbû. Gotinên diya wî mîna dilopên tirsê bi ser de hatin xwar:

- Qey naêşe lawo, kê wilo kir ji te Remo?

- Na, naêşe sibe ez ê herim cem bijîşk.

Lê (sibe) nehat û... nehat.

Raket, rabû dît ku hîn şev e. Demjimêr digeriya. Bû heft. Bû deh. Şev neçû. Rojek din çû, lê roniyê neda ser reşahiyê. Ji nişkê ve bû qerebalix. Xelk derketin nava gund û li çareyekê geriyan ku ji vê rewşê derkevin. Bû xirecira gundiyan:

- Ka em çi bikin?!

Hinek beziyan mizgeftê û dest bi nimêj û gaziyan kirin. Hinekan rojî girtin, şekir û berx kirin “sedqe.” Sibehê dîsa ro nehat der. Teneke derxistin. Wekî berê dema ku heyv veşartî.dima, bi dar û bêran kirin teqereq. Vê carê ne heyv, ne sitêr, ne jî ronahî, tiştek nedihat xuyakirin. Herdem, ji bo ji reşahiyê rizgar bibin, xort in dişandin bajarên dûr. Wan jî ev bersiv bi xwe re dianîn:

- Ev karê Xwedê ye... ev ne karê me ye!..

Bi vî awayî gund bûbû kulmek tenî.

Dizî pirr bû, kuştin zêde bû, kertfiroşên şensê (yanesîb) bûn bisedan. Boyaxçî, etar, dendikfiroş, namûsfiroş, cûzekar, qumarçî, qaçaxçî, bazirganên bêbext, sikakên gund tijî gemar bûn.

- Gund ji her tiştê paqij, paqij bû.

Roj bi roj, xelkê ronahî ji bîr kirin û bûn hevalê şevê. Reşî bû konê tevan. Karê xwe wek berê berdewam kirin. Lê Remo nikarîbû ev rewş bipejiranda, ji ber vê yekê ji xwe re bi melûlî digot:

- Ne dûr e ez guhê xwe yê din jî li ser kim.

Tevî ku ji diya xwe sedema jêkirina guhê xwe veşart lê dîsa jî gelek mirovan pê zanîbû.

Rojekê ji rojên Xwedê berê xwe da bajêr. Li postê siwar bû. Remo dît ku poste incex pêncî salî bigihêje bajêr. Pîrekek di postê de za. Du sê jin avis bûn. Dawetin lidarxistin û zewicîn. Dîsa poste negihişt. Hinek mirin. Ew bi rê de veşartin û poste negihişt. Remo bû pîzot. Aramiya wî fûriya, şewitî, hat ku dev li xwe bike, ne poste, ne tirimpêl, ne kemyon, ne ker, tiştek nehat. Teker teqiyan, guhertin. Bû xirecira wî û ajovanê postê. Xwe rakişandin hev. Rêwiyan ew ji hev kirin. Kulmoza leşkeran der bû. Serokê wan zirt lê kirin:

- Ez ê guhê te yê din jî jêkim eger tu careke din zimanê xwe dirêj bikî.

Remo bawer nedikir ku ev rawestandin ji postê bi xwe ye. Bi xwe nikarîbû. Dengê wî her kêlîkê bilind dibû:

-Bi Xwedê ev sûcê ajovanê xewar e.

Xwest ku ajovan "dergisyon" bide destê wî. Lê ji tirsa leşkeran newêrîbû. Pitepita wî ji guhê ajovan nediket. Rêwiyên siwarê postê li ber dilê wî didan û digotin:

- Remo, em tev de wek te ne. Ma qey tu ji me çêtirî?

Yekî qelew ji dawiya postê xwe rakişand Remo. Bi rûyekî tirş gotê:

- Ma qey tu ji xatûnê yî û em ji cêriyê ne lawo? De bihêle poste bimeşe. Te serê me gêj kir heyran. Xwedê ji te razî be, em dixwazin rakevin.

Pistepist xurt bû. Remo kêfxweş bû. Çend mirovên din ketin rêza wî. Zarokan dest bi girî kirin, bêhtir kêfa wî hat. Çare ew e ku ew bibe ajovan. Lê dema ku nêzîkayî li ajovan kir, tiliya wî çû ser bişkokeke sor û dewisand. Poste mişt leşkerên har bû. Bi qepera Remo girtin. Tu kesî negot çima. Bû birebira leşkeran:

- Kî mêr e, wê wekî Remo serê xwe rake?!

Serî tev bi hev re tewiyan. Kêrekê guhê Remo xist ber lingê wan. Xwîn bi qirikê ve herikî, gewdê wî jî hate xwar. Li erdê bû wek kelax. Leşkerekî guhê jêkirî bilind kir û bi sistî got:

- Vî guhî ji bîr nekin ha! Ceza wî ev e, yê ku dilê ajovanê me bihêle.

Remoyê bêhiş bi xwe re vegerandin û xelkê dest bi xewê kir. Ji xewê radibûn, xewa wan dihat. Berdestkê ajovan jî av dida yê şiyar. Tu kesî nizanîbû ku ew av tijî dermanê xewê ye. Tev de xewixîn. Gêj bûn. Gelek caran ajovan radiket û poste wilo diherikî. Kesekî newêrîbû bigota, "na" yan "çima?" Ajovan, dema didît ku her yek li ser guhê xwe yan pozê xwe ditirse, di bin simbêlan re dikeniya. Wê şeva giran nema xwe ji ser gund dida alî. Reşî bû kirasekî ji hesin û xwe li laşê gund pêça. Remo li gund bû Remoyê "biguhekî." Gundî, her yek bi xwe daketibû. Çi dibû, çi dihat serê wan, digotin:

- Ev qedera me ye.

Koçên biyaniyan li hawîrdorên gund bûn xelek. Hikumetê erdê gundiyan giş li wan parvekir. Tev de kirin xwedî qad û malên çemento. Çandinî, terektor, tirimpêl, demançe û çek dan wan. Gundî, ji ber tirsa leşker û biyaniyan ketin hev. Hinekan mala xwe ji wan re vekirin û di nav hev de gotin:

- Qedera me ye.

Lê biyanî bi birina erdan tenê qayîl nebûn. Bistan talan dikirin. Ava çem gemar dikirin û çavên xwe berdan bênderên gund. Cênîkên Remo lêxistin. Di xwe de keliya:

- Heta vir û bes! Sibe wê bên jinên me jî ji me bistînin.

Ket nav gundiyan û zengilê biveyiyê (xeterê) lêxist. Hinekan cilikên bênamûsiyê avêtin ser çavên xwe û mîna çirçirkan xwe di qulikên xwe de, veşartin. Lê ji serpêhatiya postê zanîbû ku pişta wî li dîwarekî ji kayê ye. Ev gundiyên pepûk tu carî fêr nebûne ku serê xwe li ber zora biyaniyên ku dewlet ji wan re bûbû bav, hildin:

- Em ê bi zorê bênderan bajon. Mafê me ye!

Dewleta me ya sosyalîst ev daye me. Şeva ku biyaniyan terektorên xwe amadekirin ji bo ajotina erdê bênderan, gundiyan rahiştin dar û kêrên xwe, tev de yekdest derketin pêşiya wan û qêrîna Remo bilind bû:

- Em vê zorê qebûl nakin. Yan em kuştî, yan em nahêlin hûn bênderên me bajon.

Deng tevlî hev bûn:

-Ji Xwedê bitirsin lawo. Ma qey çavê we têr nabe? Xwedê mala we xera bike. Xwîna we rijiyaye çavên we bavo.

Biyaniyan jî bi zimanê xwe vedigerandin:

- Cihê hûn jê hatine vegerinê. Divê hûn malên xwe barkin, ne em!..

Xuyabû peyv nema fêde dikin. Bi dar û kêran ketin nav hev. Wê şevê mêr û xortên gund tev de mêvanê zindanê bûn. Şeva

din, bênder tev de ajotibûn. Di bin siya demançên leşkeran de, biyaniyan genimê xwe çandin. Gundî tev de lingkul, devbixwîn, serpelixî vegeriyan mal. Bû kûre kûra diya wî û destmalek da dest ji bo şûna her du guhên jêkirî veşêre. Bi dengekî xav jê re got:

- Qey qedera me ye ku em heta mirinê kole bimînin.

Remo ma bêguh. Goştê wî dem bi dem dadiwerivî, canê wî zuha dibû û çavên wî sist dibûn. Li neynikê dinêrî, ji xwe ditirsiya. Her dihat ku bipeyive zimanê wî dibû textikek kevin. Kerteke sar ji bêrîka xwe derxist. Bi çavin tijî mirin lê nerî û xwend... (Biyaniyên parêzgeha...) nifûsa wî di nav her deh tiliyên wî de, qeto qeto bû. Di pencerê re qetên nifûsê li bahozê siwar hatin. Bûn cîq û firiyan, heta winda bûn. Remo tengirîbû. Gava derket devê derî, dengê diya wî hatê:

- Vê şevê tê herî ku lawo?!

- Ez ê herim nav gund yadê.

Gundî bi qelemaçan dilîzin. Malek bê qelemaç tuneye. Remo gavek avêt. Li gewdê xwe nerî, destê wî jê ket. Vegeriya rahişt destê xwe û meşiya. Hemrîn, qîza Cemşîd, yara wî ya zemanekî, hat bîra wî. Wê demê du guhên wî hebûn. Lê gava ku navê wî bû "Remoyê biguhekî" Hemrînê hat guhertin, ji wî ditirsiya jê dûr diket. Çawa berê dema wî didît kulîlk li rû diketin, niha wilqasî madtirş û rûzuha dibe, dema wî dibîne. Lingê Remo hilweşiya, ket, li dû ma, zîvirî. Di ber xwe de got:

- Wek diya min dibêje; ev jî qedera min e!..

Pisîkeke spî xist çewalekî û berê xwe da gir. Mezelê gund. Li cem gora bavê xwe goncalek kola. Rahişt pisîka spî. Her du destê xwe li qirika pisîkê pêçan û bêhn lê çikand. Ew fetisand, zîqînî ji pisîkê hat û termê wê li ber sola wî ket. Di guhê pisîkê de bi nermî got:

- Tu Hemrînê yî... na? Navê te Hemrîn e...

...û keniya.

Laşê pisîkê di goncalê de dirêj kir û di bin axê de, veşart. Komek kevir danî jora axê. Li qelavîska rûnişt û serê xwe danî ser her du çogên xwe. Dest bi girî kir. Çav lê sor bûn. Xwest vegere mal. Bi rê de serê wî jê ket û gindirî nav heriyê. Matmayî ma:

- Havîn û herrî!..

Devê wî bi du lêvên pûç, peyivî:

- Tu çi serê xwe dêşînî. Ro nema tê. Nema tê. Her du çav ji cih derketin û hêsir barandin:

-Ji bo Xwedê tê razê. Te xew li me kiriye hisret.

Pozê wî yê ketî kir xinexin:

- Hemrînê çû... û hey çûûûûû.

Enî qul bû, şikest. Mejiyê wî li nav herriya rê rijiya û got:

- Li min bibûre Remo. Ez bûm sedema êşên te. Lê vê jî bizanibe; dilê te jî di qurmiçandina temenê te de hevkarê min bû.

Dilê wî, mîna gogeke sor, di herriyê de çikiya:

-Ez berê kuştî me!.. Kuştî jî nikaim ti kesî bikujin.

Dil, mejî, çav, dev, poz û ling tev de, di reşiyê de bûn. Ketin nav hev, bûn laşek, bûn mirovekî perîşan û jar, navê wî Remo ye. Remo vegeriya mal. Derî vekir, şev dereng bû. Mala wî du ode bû, yek ya diya wî, yek jî ya wî bû. Bêriya diya xwe kiribû. Dema diya xwe raketî didît, perî û firişte dihatin bîra wî.

Destê xwe peland. Derî li diya xwe vekir, qîjîniya kûçikekî birîndar jê hat.

Termê diya wî ya werîs li qirika wê gerandî, li valahiya odê dihejiya û pisîkeke spî, mezin û qelew û birçî li hêviya ketina laşê diya wî bû. Saw kete nav xwîna wî. Tevzînokan goştê wî cût. Reviya, derî bi hêz girt û xwest têkeve oda xwe. Bi zirzî derî vekir. Çavên wî ketin du çavên beloq û fireh. Laşê wî jî wek ê diya wî, di dilê reşiyê de, daleqandî dihejiya. Li zimanê xwe yê kişiyayî ziq dinerî û mîna dîwarekî derizî hat xwarê.

## Ava Şîn

### Bayê felekê û welatê bextreşan

Xweşik bû.
Pirr xweşik bû.
Darek ji şînan, ji êşên kor.
Kuştiyê dîrokeke xiniz û tal bû.
Dema bayê felekê li me rabû, bû hevalê çiyan, berf dawerivî,
bû lehî, pêl bilind bûn, bîst û sê salan bilind bûn,
heta gihiştin bejna Fesîh.*

Li gundekî dûr.

Li welatekî ji tozê.

Dayikekê, xwe bi ser pêçeka lawê xwe ve, daqûl dikir. Eniya piçûk maç dikir:

- Xwedê me biparêze ji ya me hay jê tune lawo.

Lawik nexweş bû. Dikir axîn. Kalekî destê xwe danî ser rûyê biçûk û biken gote dayikê:

- Ev nalîna evîndara ye bavo! Lawikê te bi dile, diya Fesîh.

Her du keniyan.

---

* Fesîh: 1968-1991. Di Ava Şîn de li hêla "Çikûrca" şehîd ket.

Lê Xwedê zane, kalo ne şaş bû. Eger kesekî guhê xwe danîba ser dilê biçûk, wê nasbikira ku tepe repa vî dilikî, ji bo Olçya* ye. Olçya qîza Behzad e, ya ku piştî çend rojan ji çêbûna Fesîh, ronî dîtibû. Ji wê demê ve hezkirina Olçya bû dînamêt û ket sînga Fesîh. Ev nav (Olçya) gotina sisiyan bû ku Fesîh, piştî 'yadê' û 'bavo.' jiber kiribû. Her mezin dibû ev hezkirin jî di dilê wî de mezintir dibû. Bi hev re diçûn ber berxik û mîhan, Fesîh digotê:

- Berxikê min ji yê te xurttir e.

Olçya dixeyidî:

- Ê min xurttir e, were em ê şert bikin.

Her yekî berxikekî nêr tanî. Olçya bi her du qiloçan digirt û ji berxê Fesîh dûr dixist. Wî jî bi pesnan serî li berxik germ dikir. Bi hev re dihejmartin:

- Yek.. dido... sisê.

Qerpînî ji qiloçan dihat. Hev du didan ber poçan. Heta her du berx sist nedibûn, nedisekinîn. Ne Olçya ji gotina xwe dadiket, ne jî Fesîh. Bi çavgirtonekê dilîstin. Xwe vedişartin û bi 'itkê' dilîstin. Dibeziyan. Bi 'laga' dilîstin, ji ber ku Olçya li ber 'goga kevirî' bû û 'diya' wê bû, wek zarok dibêjin, carê Fesîh ji qazîvka re xwe dida dest Olçya û dibû 'diya wî' û li nav zarokan barê wê sivik dikir. Pirr lê miqate bû. Bi hev re diçûn nêçîra gambelekan û ew li hev du parvedikirin. Gambelekê reş û spî û çikçikan para Olçya bûn û hin serşîn û başoke para Fesîh bûn. Piştre, bi destê wê digirt û ew dibir ser avê:

- Ka em avjeniyê bikin.

Fesîh li aveke şîn û zelal dinêrî û digot:

- Çi ava me xweşik e!.. Çi ev ava şîn xweşik e. Bi Xwedê rihê min pê ve ye.

Wî wilo digot, ji ber ku av ya bavê Olçya bû. Ji bo avdana bexçan birk tijî bû. Mîtorê avê jî tim vêketî bû. Her du li ser qiraxên birkê bûn.

---

* Olçya: Navê gundê wî ye.

Di avê de wêneyê rûyê Olçya dît. Fesîh ji kêfa re dîn bû. Bi kulman av ji cihê rûyê Olçya tê re xuya dibû, vedixwar. Bê ku hayê wê jê hebe. Heta carekê Olçya têgihişt. Awirek dijwar di Fesîh veda û kenekî bi fedî da ser her çar lêvan.

Dinya li ber çavên wan komeke tilûr û pinpinîkên rengînî bû.

Nû Fesîh bîr bir, nas kir ku ketiye goncala evîneke bêbinî. Her Olçya didît. Pê re gurmîn ji sîngê wî dihat û xwîna wî germ dibû. Rûyê wê jî dibû kulîlk:

- Merheba...

Olçya destê xwe da Fesîh, wî jî tiliyên nazik, spî û nerm guvaştin û keniya. Olçya fedî kir û bi tinazî got:

- Bavê min li hêviya min e.

Fesîh rêçik tev lê girtin.

- Ez ji te hez dikim.

Bi gotina wî re lemên çolan şax dan. Dar bişkivîn, ber dan, heta bi lawiran serê xwe berdan ber xwe. Bask bi dilê Fesîh ve çêbûn, firiya û nema daket jêr. Olçya bilez vegeriya mal. Ji wê rojê ve kesin xerîb-biyanî, hatin gund. Di çend rojan de, bûn xwedî qad û mal, destê xwe xistin paşila her malê û dest bi kirrîna axa gund kirin. Yek ji wan zêrker bû. Zêrên wî bi deng bûn. Li bajêr, ji ber vê kef bi ser devê gelekan diket û dixwestin xwe nêzîkî wan bikin. Lê qet nediket bîra Fesîh ku zêr û gotinên hingivîn, wê serê Olçya berî her serî, bifitilîne. Matmayî ma, tev ku bavê wê Behzad gundiyekî bi şev û rojan ji bo nanê kufletê xwe, li kar bû. Roja bavê wî kontak bû û çû ber dilovaniya Xwedê bi bîra wî ve hat. Olçya ketibû derya windabûne. Geh Fesîh dikir "pêxember" geh jî silav lê nedikir.

- Ezmanê sibatê geh baran e, geh ro ye, geh jî ba tê.

Yara wî ev bû.

Her dil koçer bû.

Bîst sal di hezkirina Olçya de çûn. Bîst lib ji tizbiyeke biçûk pengizîn û di dawa zanîngehê de bela wela bûn. Ji Olçya dûr ket

û di fakulta toreya frensî de bû xwendevan. Evîn di dil de şîn dibû. Bêriya Olçya dikir, her mehekê dima digot:

- Min bêriya gund kiriye.

Eger te li mebesta wî bipirsiya dikeniya û digot:

- Min bêriya diya xwe kiriye.

Rast bû. Lê Olçya dil ji binî ve hilweşandibû. Xweş zanîbû ku Olçya keçeke gundî ye, gund jî perçeyek ji laşê welêt e. Welat jî cihê bextreş û melûl û bindesta ye. Lê, gelo bextreşî dikare mirovên binamûs çêke? Agirê evînê tevlî agirê azadiyê dibû. Aramiya wî wêran dibû. Çawa welatek seranser bibe solek ji lingekî bi qirêj re. Û tu kes nebêje "çima" her wiha pirs ji pirsê diza. Ji zû ve gotinên wisa dihatin gotin lê Fesîh her mezin dibû. Her dixwend. Ew qasî şerm li ber çav firehtir, mezintir dibû. Carinan bêhn lê teng dibû:

- Tifûû... Li wilo bext, li wilo dîrok.

Gotinên bavê wî dihatin bîra wî:

- Wey li min û li vî zemanê bênamûs.

Çi zemanekî berevajî lo!..

Di vê demê de her ku vedigeriya gund bi bêhna Olçya re giya şîn dibû. Bi deh çavan lê digeriya. Bi hezaran gotin û gazin di serê wî de kom bûbûn. Olçya jî çavekî wê li wî bû. Çavê din li zêr û gotinên xelkê bû. Ewr li ezman reş dibû. Li hev digeriya û dibû dûpişk. Rojekê Olçya gotê:

- Her tu tê gund baran tê. Çima?

Fesîh li du lêvên qurmizî dinêrî û dikeniya:

- Ez baran im, lê ka ku erd pê zanibe.

Olçya tê gihişt ku ew gazinan jê dike. Lê vegerand:

- Erda me serhişk e. Ma sûcê kê ye?

Serê xwe hejand û dev lêva xwe ya jêr kir:

- Xwezî min zanîba, bê çi di wî dilî de ye.

- Xwedê zane.

- Girrê te min dikuje lê.

- Yek ji Elmanyayê min dixwaze, yek ji Firensa, li wir dixwînin. Yek ji wan dixtor e.

- Lawê zêrker?

- Ew yek ji wan e. Ez ê li Elmanyayê....

- Tu zanî...

-Çi?!

- Wê xwîn li ser rê birije, eger tu...

- Çiii... Bi çi mafî bavo!..

Ji ezman perdeyeke reş kete nav wan. Fesîh dizanîbû, her dûrî wê dikeve, ew qasî gotinên xelkê jî di serê wê de cih digirin. Carinan destê xwe jê dişûşt lê dilê wî nedihat şûştin.

Vegeriya zanîngehê, nav civînên xort û keçên pozbilind. Nexweşiyên psîkolojîk bi xurtî serî li wir hildidan. Bi danûstandinên dûvedirêj ve mijûl bû, lê tiştek nedihat guhertin. Eger gotina “Welat” dibihîst, pêncî mirî, bi hev re serî hildidan. Şiyar dibûn û agir vêdixistin. Tim ji xwe dipirsî; çawa wê hîn xwendinê bigihîne serî û hîn... û hîn? Nema dikarîbû li hêviya ketina bar ji ser pişta dil raweste. Zor tenê kare zorê bide alî. Ne hêzeke mezin be tu mafên mezin bicih nayên. Digot:

- Ê ku mafê xwe bi gotinên bêkêr dixwaze, wekî wî mirovî ye, yê tê ku di avê de bifetise û dest û ling pûç bin. Em kufikî bûn bi van (daxuyaniyan). Êdî ne bi şer be em ji şer paqij nabin.

Berî çûnê ji diya xwe re got:

- Heta welat çênebe, ez venagerim!

...û çû.

Bi sedan çûçik, teyr û tilûr di zikê ezmên de difiriyan. Dengê baskên wan li ber guhê Fesîh dibû mîna dengê tembûrê. Bi vê diltenikiyê têkiliya wî bi tivingê re dest pê kir. Êvarekê, tivinga xwe sipart kevirekî mezin ji kevirên çiyê. Pê re mijûl bû:

- Xweziya min bi dilê te. Xweska mirov ji hesin ba.

Li xwe vegerand:

- Bi Xwedê birînên me karin hesin jî bihelînin.

Ez bi vê tenê dêşim. Miletek sax bûye boyaxçî û gerson û rêncberê ber destên xelkê. Tiving hilgirt, dewsa wê şil bû. Matmayî ma. Ev çi ye?

Qey hêsirên tivingan jî hene? Ev çi av e, ji ku hat, ji pêvî Xwedê, kesekî nikarîbû bersiva van pirsan bide. Dengê hevalê wî ew şiyar kir:

- Fesîh xwe amade bike, da em herin.

Bi koma hevalên xwe re, berî da Ava Şîn. Ketin riya dijwar û dirêj. Nêzîkahî li avê kirin. Serê wan di nav mij û dûmanê de, winda dibû. Ezman tarî bû. Peşkên hûrik bariyan. Fesîh li kêleka Ava Şîn rûnişt û ramanên wî ew birin û anîn. Birka bavê Olçya hat bîra wî, wisa jî wêneyê wê. Lêvên sor, dema di avê de, biçûk û mezin dibûn. Diya wî, di avê de mîna şitlekê şîn dihat. Vê ava zelal, her tiştê tenik di jiyanê de anîbû berçavên wî. Yar, dê, zarotî, bihara gund, azadî, xortaniya zuha, çivîk, berf, gambelek, mirina bav. Hêêêêh! Hat ku bi rewşa xwe bikene. Her du çavên wî bi hêsirên sar şilbûn. Li tivinga xwe û li rûyê avê dinêrî. Baran xurt bû. Hevalên wî, yeko yeko xwestin xwe li avê xînin û derbasî aliyê din bibin. Lê ezmanê reş û qelişî zor da zîpik û bahoz û baranê. Xuşîn bi avê ket. Bû gujeguja pêlan û lehî rabû. Ji ber ku Fesîh pir ji avê hez dikir û ji ber ku kêfa avê jî jê re dihat, avê rahişt laşê wî, tevî tivingê û ew ji xwe re bir. Laşê wî bû hevalê pêlan. Pêlên dîn. Pêlên bêserî. Pêlên kesk, Pêlên sor. Pêlên zer. Laşê Fesîh ê lihevhatî, bi pêlan re dûr bû. Nêzîk bû, mezin bû, fireh bû, bilind bû, bilind bû, bilind bû, gihişt zikê ezman. Laşê Fesîh bû çiya.

Çiyayekî din li çiyayên Kurdistanê zêde bû.

## Bêhna Qedexe

Bêhn li çar hêlan belav bû.

Bêhneke biyanî.

Bêhneke dijwar.

Dîwarên pirsan li her alî bilind bûn. Hinek dipişkiyan, gêj dibûn û hinek jî ditirsiyan. Çogên hinekan dilerizîn û xwîna hinekan dikeliya. Kef bi devê hinekan diket. Şûr simbêlê hinekan nedibirî. Êş ketibû hestiyan. Gelek serî ketin gerînekê. Gelek dilan bi destên hev du girtin û govend gerandin. Gelek cendek û laş ji tirsan re, ji jor ve hatin xwar. Dinya li nav hev ketibû. Kevir dibariyan. Bi hezaran çav hebûn ku çaralî dinerîn. Ax dişewitî û ezman devê xwe bi deh gazan, ji hev vedikir. Gelo çi bûye? Kî dizane ev bêhna ku roj bi roj xurt dibe bêhna çi ye? Bû hewar hewara generalan. Artêş li nav hev ketin. Bêhnê erdê gelek paytextan hejand. Dewletan kir qideqid û bi sedan kûçik civandin. Li şûna bêhnê bajar bi bajar, gund bi gund, geriyan. Bi sedan xelkên sivîl hatin kuştin; balafir, tanq, top, bombe, çekên nitronî, tev de dijî vê bêhnê ketibûn tevgerê. Li gelek cihan cihokên xwînê herikîn. Bi rijandina xwînê dabûn pey wê hetanî ku gihiştin şûna vê bêhnê. Bêhn ji çiyayekî bilind difûriya. Li erd û ezman belav dibû:

*Canê canê canê Were meydanê*

*Dilê min pirr xweş e*

*Bi vê dîlanê*

Serokên artêş û dewletan bi serê xwe ketin. Jinên wan porê xwe kişandin:

- Divê ev çiya ji kokê ve bê hilanîn. Divê ev bêhn tune bibe.

Di çend rojan de parlamenter, hozan, siyasetvan, zana, serokleşker û xelkên wan, tev de bûn yekdest da ku çareyekê ji vî çiyayê bêcir re bibînin. Ne dînamêt, ne mayîn û bombe, ne jî tang û balafiran fêde nekirin. Bêhn xurttir dibû. Her perçeyek ji çiyê diket, dibû gihayek û bêhn dida. Bêhneke wisa bi xelkên çiyê ji bêhna misk û enberê xweştir bû:

*Keç û jin pîr tev*

*Rabûn tev dest dan hev*

*Xort giş hatin birev*

*Ji bo dîlanê.*

Vê bêhnê, agir di dilên wan de dada. Bi dehan, bi sedan, xort û keçên wan, bi xwîna canên xwe ev giya av didan. Her kevirek ji wî çiyayî diket, li aliyê dinî çiyê deh kevir kom dibûn. Dewlet ketin hev de. Bêhna xelkên wan berî ya leşkerên wan, diçikiya. Xew li wan bû hesret. Nanê xwe, berî ku bixwin di destê wan de dibû textik. Ava xwe, berî ku vexwin li ber devê wan dibû herî. Li ser zikreşî, çavsorî û kînê xwedî dibûn. Her yekî dixwest goştê laşê birayê xwe bixwe. Gotûbêj û danûstandinên li ser pêwîstiya qirkirina çiyê, lidarbûn. Dengê generalê mezin bilind dibû:

- Sê roja bêhna xwe li min fireh bikin, roja çaran, wê ev çiya tune bibe.

Kêfa wan hat. Çek û hêzên dewletê tev li çiyê bûn yek. Bêhnê leşkerên wan li erdê kirin term. Can ji laşên wan dikişand. Carinan sê roj, deh, bîst, sîh roj derbas dibûn, dîsa jî bêhn ji laşan difûriya. Bêhn wekî dûmanê, ji qelş û kortên çiyê dihat der. Rojname û kovar, bi gotar û nerînên li ser dîroka çêbûna çiyê û çawatiya rahiştina wî ji binî ve tije bibûn. Hineka digot:

Bêhn şaşitiyeke dîrokî ye.

Hinekan jî digot:

- Bêhn ji çêkirin û kedîkirina dewletên din e. Nemaze dewletên cîran. Cîranan ev bêhn bi ser serê me de rakirine. Hinekên dîn ev giya çandin, xwîna xwe jî bi derewan li ser kirin û tiştek bi dest nexistin. Ev giya şeytanî ye.

Di wan kêlîkan de, giyayekî nû bi quntara çiyê ve şîn dihat. Bi dehan pirtûk li ser vê pirsgirêkê hatin weşandin. Bêhna vî çiyayî wê çawa raweste? Kuştina çiya? Rahiştina wî? Lê hîn bi vî çiyayî daketibûn, gava ku qêrîn bi serleşker û berpirsiyarekî wan ket:

- Bêhn ji çiyayekî din jî tê.

Bêhnê ew xistin gerînokê. Giya li serê wan bû tevin. Şerekî giran di navbera çiyayan û hêzên dewletê de çêbû. Xwestin kevir li ser kevir nehêlin:

*Dîlana şoreş e*

*Herkes pê serxweş e*

*Erd û ezman şîn bûn*

*Bi vê dîlanê.*

Televizyonên dewletên din jî ji xwe re, bi wan dikeniyan. Şerê napalm, balafir, bombe û artêşeke mezin bi çiyayan re. Tiqetiqa temaşevanan bû. Li ber van wêneyên tevlîhev çiya bûn bela serê dewletê. Xelkên çiyê jî ji hev re digotin:

- Wey sed xwelî li serê çiyê be eger bi van hesink-mesinkan ji hev bela bibe, yan serê xwe daxe. Her kesî jî zanîbû ku çiya nikare xwe daqûl bike. Û sertewandin ne karê çiyê ye.

Dewletê lawirên giyaxwir kom kirin. Ew birçî dikirin û berdidan hawîrdora çiyê. Giya tev de serqut kirin. Tayekî bi tenê dirêj nema, lê ew giya bû jehr û kete zikên van lawiran. Pê re-pê re, li erdê digevizîn. Te digot qey ne ji niha ve, lê ji berî heft salan ve mirine. Bêhna laşên lawiran kete nav bêhna giya û wekî mijê, bêhnên xweş û nexweş, li serê çiya kon vegirtin. Giya dîsa şîn hat:

*Dîlan gelek xweş bû*

*Delîl pê rûgeş bû*

*Dilê dijmin reş bû*

*Bi vê dîlanê.*

Dewleta şiyar nifşek lawirên din anî. Ew jî çû. Yekî din anî. Fabrîkeyên çêkirina lawirên giyaxwir vekirin. Çi lawirê goştxwir jî hebû, serê wî di cih de jêdikirin. Gava lawiran erd ji giya paqij nedikirin, dewlet bi xwe, bi leşker û mirovên xwe diketin nav erdên kesk û giya bi dev û diranan dixwarin. Her ku bêhn ji çiyê derdiket, giya jî pê re şîn û bilind dibû. Nû nas kirin ku giya û bêhn, mîna goşt û xwîna mirovekî zindî di nav hev de ne û ji hev nabin. Bêhnê şînbûn û bilindbûna giya geş û gurr dikir. Ji ber vê, lawir û ajel nema di ber pirbûn û gurrbûna giya re, digihiştin. Dest bi vekirina dibistanên taybetî yên perwerdeyê kirin. Mirov fêr dikirin, bê çawa ji bo bidestxistina siberojeke xweş û qezenckirina pereyan, divabû ku hînî xwarina giyê bibin. Bi hezaran mirov bi rola lawiran rabûn. Hinek jî bûn lawir û mejî û giya û kevir û ax û goşt û nan... dixwarin. Nema li tiştekî dipirsîn. Çemên dirêj vexwarin û miçiqandin. Berê xwe dan heta bi ezman û xwestin wî bixwin. Lawir ji mirovan pirrtir bûn. Bêhn jî girantir dibû. Giya bêhtir belav dibû:

*Ev bêhna çiya ye*

*Hawîrdor giya ye*

*Wek bêhna bûka ye*

*Bêhna vê dîlanê*

Dewlet bû dewleta lawiran, lawirên zer, şîn, sor, reş, giyaxwir, goştxwir, mirovxwir, baranxwir û Xwedêxwir. Lê, bêhnê serî li wan gerandibû. Ketibûn xeleka windabûnê, nemaze piştî ku kevirên çiyayên bibêhn, diranên wan diweşandin nav axê. Polî poşman vedigeriyan. Ji hev dipirsîn:

- Gelo çawa em ê vî çiyayî bixwin?

Ne giya hişk bû. Ne çiya herifîn û ne jî bêhn rawestiya. Lawiran jî nema dizanîbû çi bikin. Dewletê, bi sedan kemyonên mişt diran, ji dewletan kirî. Bi çewalan diran kişandin dora çiyê. Her lawirekî xurcika xwe tijî diran kir û dest bi xwarina çiyan kirin, kevir bi kevir.

## Gula Omeriyan Têlo

Navê wî ev bû. Hem ziravik bû, hem jî tim li kêleka têlên sînor bû. Nobedarê pez û reşiyê û bombe û hejarî û êşan bû

Têlo, li ser girekî bilind, li binxetê, rûniştibû. Berê xwe bi aliyê bakur ve kiribû. Dengê wî tevlî kîna dilê wî dibû û diherikî.

Rojekê ez ê...

Li bin çiyayekî Omeriyan rûnêm û ez ê bigrîîîîm û hey bigrîm.

Di tola xwe de, diramiya. Zarotiya tozgirtî. Keriyê pez ê ku ji xwe re birin. Wî çaxî biçûk bû. Dema bavê wî mir û ew, sêwiyê Xwedê, wekî şivanekî biçûk li ber keriyekî bêserî, li hawîrdora sînorekî bê îman, bitenê hişt. Gava ku pêxember bi bîra xwe dianî, bi rewşa xwe razî dibû. Jixwe pêxember jî wekî wî, di zarotiya xwe de, şivan bû. Têlo dest bi xwendinê kir. Tim di xurcikê kerê wî de pirtûk hebûn û tim jî li hêviya “Cibrîl”ekî bû ku nameya Xwedayê mezin jê re bîne. Lê, carinan êşeke giran xwe bi nava wî digirt, nemaze gava gotina pêxember dihate bîra wî (Ez pêxemberê herî dawî me...) Têlo pirtûk bi dû pirtûkê de dixwend, lê ne Cibrîl hat ne jî ew hat bîra Xwedayê mezin ku nameyekê jê re bi rê bike. Wek xewnekê dihat bîra wî.

Qaçaxçiyan, bi alîkariya leşkerên sînor ku dev û bêrîkên wan dadigirtin, keriyên pez derbas dikirin Serxetê. Têlo, ji qaçaxçiyan re dibû “Delîl” ji ber ku temenê xwe tev de li dora sînor bihurandibû. Bombe ji bin axê derdixist wekî tu kerengekê derxî. Hêdîka pê dilîst û dû re dixist kîsê xwe û dianî malê. Wê şevê

xwe li ser sînor ji bîr kir û keriyê wî birçî mabû. Bang li mîha xwe ya "şigêr" kir. Mîhê her du lingên xwe yên pêşî di sînga wî de çandin û gepa nan ya dawî xwar. Di wê kêlîkê de, leşkeran êrîş kirin. Hema şivanê biçûk her du destê xwe kirin mîna zirnê û qêrîna wî li nav pez û li ezmanan belav bû. Bû xirecir û ew û pezê xwe bi hev re reviyan bi aliyê Amûdê ve. Pez jî gava ku birçî be û li bistanekî rast bê, tev de, wekî şîşa tivingê, dikeve xêzin rast û bi dijwarî ji hevdu belav dibe. Xwediyê bistan ber bi Têloyê reviyayî ve hat û bang kir:

- Çi heye lawo... Çi heye?

- Apo, leşker hatin me, leşker.

Dengê kalo li ezmanekî reş û tazî dilîst:

- Wey min di çiçikên diya wan kutayî. Ev bênamûs dev ji kûçikaniya xwe naqerin lawo.

Kulmoza leşkeran li wan der bû. Têlo û kûçik û ker û pezê wî tev de dan ber xwe û vegerandin bi aliyê bakur ve. Têlo li koma çirayên hûr û vêketî yên Mêrdînê dinerî û di nava xwe de diqiçqiçî. Termê Kalo li dû xwe hiştin li ser sînor heft heşt mîh li erdê gêr kirin, kuştin. Xwîna mîhên Têlo tevlî axê dibû. Ax û dilê wî bi hev du re difûriyan, digiriyan.

Rojekê ez ê...

Li ser vê axê rûnim û ez ê bi kulman wê bi ser serê xwe de bidêrim. Ez ê girîkî bikim ku tu carî mirov wisa negiriyane. Ez ê erd û ezman bi hêsirên xwe bişom. Têloyê biçûk, di nav lepên wan de, dilerizî.

Yekî ji wan got:

- Em ê wî bikujin.

Ê din, lê vegerand:

- Em ê wî sax bibin qereqolê, wê kêfa wan bêhtir bê.

Têlo wekî çêlîke çûkekî peritî û sar, zimanê wî dilerizî û bêhest, bêdeng û bêhiş mabû.

Li qereqolê ken dest pê kir.

Mezinê wan jê re got:

- Eger tu karibî bi dengekî pez tev de bidî dû xwe, em ê pezê te bi te din. Leşkeran pezê wî tevlî pezên din kirin. Dora hezar mîh û beran tevlîhev bûn:

- Divê sêsed mîhên te bi dengê te ve bên.

Xwîn bi laşê Têlo ve hat. Bawer kir. Kurtanê kera xwe şidand û li ber serê pez sekinî. Destên xwe dan ber devê xwe û Nisêbîn, Qamişlo, Mêrdîn û Amûdê tev de bi dengê wî re li hev ketin. Sêsed mîh bi hev re bask bi wan ve şîn hatin û ber bi Têlo ve firiyan. Çavên wî tijî hêsir bûn. Weke kulîlka insane sor bûn. Leşker jî tev de mîna mîhan di cihên xwe de kêlîkekê bêdeng man. Lê Têlo bi tiqe tiqa kenê mezinê wan re bi xwe şiyar bû û naskir ku tu dil di bin van cilên kesk de tunene. Yekî ji wan bi çeplê wî girt û berê wî bi binxetê ve kir:

- "Git… köpek oglü köpek!"*

Têlo, sola xwe li şûna xwe hişt û pêxwas beziya pêxêla Binxetê. Xwest ku bombeyek wî ji hev perçe werçe bike û venegere. Dixwest her pariyek ji laşê wî bifire hêlekê lê daxwaza wî bi cih nehat. Berê xwe bi jor ve kir û kela girî qirik sot:

Xwedêyo… rojekê ez ê… hilkişim cem te û ez ê serê te bi xwîna xwe bişom. Ez ê her du lingên te di nav hêsirên xwe yên germ de bihêlim, heta ku piçika qirêjê bi wan ve nemîne. Belkî wî çaxî tu bi me hest bibî. Piştî demekê li ser van ramanên "gawirî" poşman bû û vegeriya mal. Dilovanî ji Xwedê xwest û her pênc xwediyên pez, ji bo vegerandina pez, ber bi serxetê ve hilkişiyan.

Ji wê rojê v Têlo mezin bû. Girr û kîn jî pê re mezintir dibû. Kirasê melûliyê çirand û sîngtazî li dora sînorê bêbext bombe hilkirin. Helbest ji xwe re diristin. Li wan çolan distira, heta ku radiwestiya dû re karê xwe berdewam dikir û li jor dinerî.

Li çiyayên Omeriyan, roj bi roj, tiştin mezin nas dikirin. Tiştin nayên gotin lê tên dîtin. Tu nabê ev sînor dewletan çêkiri-

* Here, seyê kurê sê..

ne. Dewlet jî artêş û çek û qereqol in. Têlo, ji nişkê ve dît ku ji çar aliyan ve laşê wî bi dewletan pêçayiye. Û li her alî jî bombe çandine. Bombeyên ku xelas nabin. Her bombeyek radikir, deh dihatin çandin. Rojekê li qelevîska rûnişt. Serê xwe danî ser her du çogên xwe û dest bi girî kir.

Rojekê ez ê...

Heriya zivistana vî welatê bêxwedî tev de di rûyê diya xwe bidim.

Di havîneke germ de ez ê keziyên wê bi ser serê xwe de kurr bikim.

Werîsê kîn û hêrsa wî dirêj bû, heta gihişt diya wî ya reben ya ku nema dizane bê çawa di vê çola bê xwedî re derketin û çawa ew aniye ser rûyê erdeke vala û bombekirî.

Erê yabo...

Ma, ji pêvî vî sînorê bombekirî û vê erda bênamûs, te ti cih nedît ku tu lê bi cih bibî!

Nema zanîbû bê berê xwe bide kê. Xwedê, yan dê, yan jî bavê ku serê xwe danî, ji bo ku serê wî têxe nav teqereqê. Nav û dengê Têlo belav bû. Tivingên Emerîkî difroşe, wisa jî bombe, dînamêt, cil, çek, tûtin, hesin, çaya hişk û sol. Têlo filitîbû ser sînoran, li dora xeta tirênê diçû û dihat û leşker tazî dikirin. Dev ji xwendinê û şîretên diya xwe berda. Şeva wî roj bû, roja wî jî şev bû. Dema roj diçû ava, şa dibû, rûgeş dibû û dibû mirovekî din. Dengê wî zelaltir dibû. Bavê wî mir û çîrokên Omeriyan bi xwe re birin gorê lê çend stranên xweş jê re hiştin. Her şev li bin taveheyvê û roniya stêran bi du çavên ji agir û seriyekî dagirtî, li wan cihan dinêrî.

Rojekê ez ê...

li kêleka çiyayekî Omeriyan rûnim û ez ê kevirê herî mezin bi ser serê xwe de berdim, bera perçeyek ji vî serî sax nemîne. Erê yadê, rojekê ez ê xwe û te her duyan bikujim.

Xelk jî bi Têlo daketibûn:

- Têlo li tiştekî buha û mezin digere.

- Ew û Ezraîl destbirak in.

- Girekî zêr heye, Têlo lê digere.

- Ku bêhna Têlo diçe leşkerên sînor, leşker di cih de ji desthilanîn dikevin û dilên wan dêşe.

Têlo bû dêwekî ji agir û di şevên reş de diçirisî. Xelk û leşker bi hev re jê ditirsiyan.

Tim bi rextan pêçayî bû. Hewşa xwe kiribû gora tivingên Emerîkî. Geh bi bertîlan, geh bi zirtan leşkerên Binxetê ji mala xwe dûr dixistin. Lê vê gavê bû qal û behsa ronîkirina sînor. Ji ber ku xirecir zêde bûbû, xwestin li seranserê sînor lempeyan deynin. Nema qaçaxçî tenê diçin û tên. Bi sedan xort û keçên şervan jî çêbibûn. Bêhna şoreşekê belav dibû.

Ji Têlo re li hev hat, digot:

- Roja ceng hebe, ew roj daweta min e. Roja bê ceng li hember van kûçikan derbas be, ew roj ne ji temenê min e. Dest bi kişandina stûnên hesinî bû. Her ji sed gavî stûnek diçandin û lempeyek datanîne ser. Her ku wan di rojê de stûnên xwe yên hesinî diçandin, Têlo bi şev ew stûn li bazarên Amûdê û Qamişlo erzan difirotin. Şirîkekî hesinfiroş ji xwe re dît û karê xwe fireh kir. Bi erebê û hesp dest pê kir. Lê xwediyên ereban newêrîbûn pê re berdewam bikirana, nemaze piştî kuştina yekî ji wan. Tev de sûnd dixwarin ku nivîştin di bin çengê Têlo de hene. Nivîştine Xwedayî. Ajovanekî terektorê got:

- Min bi çavê xwe dît ku leşkerekî cercûrek sax di laşê Têlo de vala kir û Têlo nemir.

Carekê şirîkê wî pê re çû nêçîra leşker û hesinan. Têlo jê re gotibû:

- Bi xwe çûna ber xetê, ji min re, wek çûna vê hewşê ye. Ji ber ku ez sînor ji hewşa xwe bêhtir nas dikim.

(...Ez wê şevê ji bîr nakim. Ez û Têlo, me nêzîkayî li sînor kir. Têlo sînga xwe tazî kir. Ti nivişt, ne di stûwê wî de, ne jî di bin çengên wî de, nebûn. Xwe bi rextan pêça, rahişt tivinga xwe û min da dû, em gihiştin pişta xetê. Li wir jî pûş digihişt kabokê. Hema gulle û bi ser me de bariyan. Toz û dûman û bahoz tevlîhev bûn. Leşker bi tirimpêlên xwe li me digeriyan. Carekê tekerê tirimpêla wan li pişta min ket. Min kirî bigota “teslîm” lê min negot. Eger ku gaveke din tirimpêl vegeriya, wê ez bikuştama. Lê qey Xwedê temen dabû min, dengê ken û qerebalixa wan hat. Min go qey Têlo kuştin, lewra ew dikenin, ez yek carî ji hev ketim. Lê mîrata mirinê tal e. Min xwe bi qulpan û zikkişkê ji sînor derbas kir. Berê sibehê, ez nîvsax û nîvmirî, gihiştim malê. Çend pirsan ez dabûm ber peşkên xwe. Gelo Têlo kuştine, yan na? Eger vê carê filitîbe, gelo wê dîsa nêzîkî sînor bibe? Ê min bi xwe, ez nema nêzîkayî li sînor dikim. Lê bersivên pirsên min zûka hatin ber min. Piştî nîvro Têlo ez ji xew rakirim û got:

- Tu îşev jî nayê ser sînor?

Wê şevê dîsa tîrêjên agir zikê reşiyê diçirandin. Xelkê tev de dizanîbû ku Têlo û leşker li ber hev sekinîne û şerekî giran li darketiye. Tev de jî dizanîbû, wê serê sibehê bazarên Amûdê û Qamişlo mişt hesin bin. Bê ku ti kes çavê wî li Têlo bikeve, Têlo hesinfiroş pirr kirin û ew bixwe nebedî bû. Du hikûmet bi hev re lê digeriyan. Tirsê li hawîrdora sînor kon vegirtibû:

- Ev têl û bombe ne bes in wê hîn kehrebê jî bînin.

Leşkeran, her ji dused gavî qereqolek biçûk li jora stûnên hesin ava kiribûn û bi şev di pencereyên wan re nobedariya sînor dikirin. Û bi ro, dadiketin koncal û çeperan. Koncalin fireh kolabûn û xwe dixistin pişt axa wan a komkirî. Têlo biryara xwe li ber xelkê dabû:

- Roja ku we li ser sînor lempeyên vêketî rêzkirî dîtin, zanibin ku Têlo miriye.

Lê wekî bawer kiribe ku êdî ew roj wê bê.

Her ku teqereqa tivingan bilind dib,û wêneyê Têlo dihat ber çavên xelkê û ji hev re digotin:

- Vî mêrî Ezraîl ji xwe re sûnd daye.

- Bera kes ji Têlo pê ve nebêje ez mêr im.

Têlo rûnişt û li cihekî dûr dinêrî. Li jor dinêrî.

Rojekê ez ê...

Hilkişim ser serê çiyayekî bilind, li vî welatê ku ji pêvî mirov, her tişt lê mezin e. Koletî mezin e. Mirin mezin e. Bênamûsî, xiyanet, tirs mezin e. Ez ê herim jora wî çiyayê bilind û ez ê ji Xwedê re bêjim; ma qey tê me heta hetayê ji bîr bikî?! Û ez ê xwe ser serî bavêjim ser vê axa bêhest. Ez ê wekî qantirekî serjêkirî, xwe di xwîna xwe de bigevizînim, heta hiş û dilê min pûç bibin.

Di wê kêlîkê de, qerebalixa leşkeran bilind dibû:

- Ev ne karê mirovekî û diduya ye. Ev karê grûpên van "Terorista" ye.

Têlo bêhna bi hezarên leşkerên ku li ser sînor belavbûyîbûn, dikir. Zanîbû ku leşkeran hêzeke bêserî amade kirine û stûnên xwe yên hesinî bi xwe re hilgirtine. Rê tev de li ber çavên wî hatin girtin. Wê şevê her du çavên xwe girtin û xwe li sînor xist. Piştî çend rojan, nema dengê qurçînan xelk ji xew şiyar kirin. Nema tîrêjên sor zikê şevê qelaştin. Hesin li bazaran kêm dibû û buha dibû.

Lempeyên vêketî, her şev, li seranserê sînor rêzkirîbûn.

Tenê çiyayên Omeriyan xwe daqûl kiribûn û hêsirên xwe paqij dikirin.

Li hêviya tiştekî bûn.

## Keldûman

Çîroka jiyana... Mistoyê ku ji diya xwe bêdeng ket.
Û bêdeng jî...
Agir laşê wî hêdî hêdî dixwar.

Misto li ber neynikê bêdeng û bi tenê rawestiya bû. Keldûman jê diçû.

Di nav dûmanê de, mat mabû. Berbangê ji xew veciniqî. Xuşexuş ji serê wî dihat. Laşê wî sincirî bû. Bi lez çû ber neynikê û li xwe nerî.

- Yadêêêê.... ev çi ye?

Tu çi bibînî!

Nerî ku dûman ji guh û devê wî dertê. Ji nişkê ve, bi her du destan, zeft bi guhê xwe girt. Devê xwe jî girt. Nalînek ji kûraniya dil kişiya. Xuşexuş di serî de xurttir dibû. Nû Misto nas kir ku keldûman jê diçe. Wisa guman kir ku piştî çend demjimêrên din, wê piçikek goşt jî bi laşê wî ve namîne. Kete nav pêlên ramanên reş û tirseke zor û giran:

- Gelo wê hestiyê min jî bibin dûman yan ez ê bimînim komek hestî?

Li kemenca xwe geriya û di ber xwe de, got:

- Belkî xewn be?..

Her ku diket tengayiyê, gerdûn li serê wî dihat hev, dibeziya ber bi kemencê ve. Vê care, berî ku dest dirêj bike têla wê ya

şêrîn, dît ku agirek hûr ji têlan hildikişe û kemenca wî jî wekî wî dûman jê bilind dibe. Bi rûyekî guvaştî û laşekî lerizî vegeriya ser nivîna xwe. Xwe dirêj kir û bi tiliyên bê neynûk axa dîroka xwe ya windayî kola...

Ji diya xwe,... bi tenê ket.

Xweşiya zarokatiyê nedît.

Xortanî bi tenê derbas kir.

Û bi tenê jî niha laş û can hêdî hêdî dibû dûman û li valahiya ezman winda dibû.

Weyyy!..

Li min û li vî temenê vala û pûç.

Lê ji ber ku di qata şeşan de bû, dengê axîna Misto nediçû kesekî.

Ji nas û kesên derdora wî, kê pirsa mala wî dikir, digot:

-Ez cîranê Xwedê me.

Bi vê bersivê, xwe ji ber mêvanan dida alî. Tevî ku bi dehan ji xortên zanîngehê hevalên wî hebûn. Lê xwesteka xwediyê xanî dema ku misto kirê kiribû, ev bû:

- Divê çûn û hatin li bal te tunebe.

Ji neçarî û kêmpere xwesteka wî pejirand û ji xwe re got:

-Ev mirov çi dewar e. Nizane ku kemenca min, hember sed mêvanî ye.

Lê Misto jî nizanîbû ku her tiliyên wî yên sivik kemencê hildidin ser piyan, hêsirên zelal û hûr ji çavên reş û xilmaş, li qata pêncan, dihatin xwar. Her êvar xwediya çavên reş û xilmaş li hêviya dengê kemencê, tev de dibû guh. Şeva ku nalîna kemencê bilind nedibû, xew jî nêzîkî çavên reş û xilmaş nedibû. Lê Misto mabû dîlê çavê “Bêmal”a kambax. Tevî ku bi salan wê nabîne lê wek diya wî digot “dil dil e, ne sênîk burxul e.” Tevî ku wê dil nedîtibû jî lê heta roja îro serî bilind dike û pesnê xwe dide ku heta mirinê ji bavê Misto re negotiye û nabêje “na” û demek nimêj lê

neçûye. Ji ber vê yekê hêviya wê bi bihuştê xurt bû. Lê nizanim çima li rabûn û rûniştinê, li çûn û hatinê, tim digot:

- Xwedêyo tu me ji "munker û nekîr" ji agirê dojehê, biparêzî

Di wê kêlîkê de.

Perçeyek sax ji laşê Misto dawerivî.

Demekê zarok bû.

Radihişt pirtûkên ji xwe girantir û berê xwe dida dibistanê. Tevî ku gemar gelek caran di bin neynûkên wî de hişk dibû, lê dîsa jî mamosteyan teva jê hez dikirin. Ji bîra wî naçe, sala ku kete pola çaran. Navê mamosta wî "Rojîn" bû. Dema Rojîn dikir ku bi mamosteyekî din bê guhertin, Misto serî danî ser masê û bû kûre kûra wî. Mamoste lê civiyan û pirsîn:

- Tu çima digirî?

Çavên xwe yên sor û tijî hêsir xiste çavên wan:

- Ez ji mamosta xwe "Rojîn" hez dikim. Naxwazim ji me dûr bikeve... Ez naxwazim.

Girî bi hewar û keser berdewam kir, lê Rojîn çû. Çûyîneke bêveger. Ji mêj ve, wê şagirtê xwe Misto ji bîr kiribû. Lê Misto her tişt li ser Rojînê dizanîbû.

Mêrê wê kî ye, zarokên wê çend in, navên wan çi ne, ji dûr ji dûr her tişt dişopand. Hetanî ku piştî gelek sal û ji nişkê ve, hezkirina "Bêmalê" keça Rojîn di dil de teqiya û pijiqî. Pirîskên evîna wê bûn çemek ji agir. Bûn deryayek dadayî û nema vemirî. Berî vî tiştî her ku Misto mezin dibû, bav jî digot:

- Va bijîşkekî me jî çêbû.

Lê Misto bi qutîkê helaw û penêr û mûyên teriyên hespan daketibû. Tembûr ji xwe û zarokan re çêdikir. Bê ku zanibin çi dibêjin, qîr dikirin stranan. Her zivistan dihat, hev du talan dikirin û derdiketin "Bûka Baranê." Her yekî paçikek li serê darekî dirêj digerand, radikir jor û bi hev re dikirin qêrîn:

Ya rebî baran bê –amîn

Golika me giya divê –amîn

Zik birçî ye nan divê –amîn

Me j' Xwedê baran divê –amîn

Û li cihên din jî deng bilind dibûn:

Baranê bibar bibar

Çûçika genimê me xwar

Sêwiyan serê hev xwar

Geh jî dida dû bavê xwe yê "Hecî." Gomlekê xwe yê bipîne berevajî li xwe dikir û li ber goristanê, derdiket nimêja baranê. Dest, bi sedan ber bi jor ve dibûn û hezar deng dibûn yek:

- Xwedêyo...

Xaka me tî nehêl

Zarokên me birçî nehêl,

Xwedêyo..

Kesî me tune j'pêvî te

Vê carê tenê

Bibîn rewşa me

Geh ewir hişk dima, geh jî baran dibariya. Hîn ewir û kevir û hesp û Bêmalê û gor û baran û roj û gomlek di serê wî de nav hev diketin. Perçekî din ji laşê Misto dawerivî û bû dûman. Roj bi roj nas kir, piştî duwanzde sal xwendin ku hatiye axurekî! "Ev ne zangeh e, ev nezangeh e." Hêdî hêdî hêviya wî bi dîtina xort û keçên rewşenbîr windadibû. Nemaze di salên destpêkê de. Kete deryaya siyasetê û "xebata ji bo welêt". Bi germî kar kir û her sal ev gotin dubare dikir:

-Îsal sala me ye. Îsal, em ê cîhanê bihejînin û armancên xwe, bi alîkariya dostan, pêk bînin.

Lê, sal bi sal dem diçû.

Ne salek xweş hat.

Ne kesî cîhan hejand.

Ne jî dost man.

Hew tevkuştin pirtir dibûn. Karê wî mabû hejmartina partiyan û zayîna wan a her meh. Çîroka gamêşan hate bîra wî. (Goştfiroş gamêş tev de dajotin ber serjêkirinê. Gamêş jî bi rê de li hev du siwar dibûn.)

Yê dilpak li jêr dima, yan jî bi bêbextiyekê wî davêtin nav şekalan. Bi tirşik û goşt û girarê hevdu razî dikirin û dibûn serdar û "serok."

- Xêza xwar ji gayê pîr e.

Ka, Mistoyê pepûk, di nav beroşên tirşik û germiyê de, ji pêvî ku rahêje kemencê û ji "Bêmal"a bêbext re bide sazan, wê çi bike:

*Ey dilkoçerê*

*Rû pêxemberê*

*Bûm kulmek arî*

*Te ez dêram li rê*

Misto di çûn û hatinê de digot:

-Gurrî bûye sermiyanê mala bavê min. Tu çima nabêjî; mala bavê min qeliyaye... Loo.

Bi vî awayî, her sal, di xwendinê de, dişikest. Piştî heft salan, nû bû sala sisiyan. Pitepita bavê wî ji guhê wî nediket:

- Heso, li gundê me hebû Heso. Her nifşek zarok li gund mezin dibû, Heso jî bi wan re dibû heval. Wekî ku di temenekî de bin. Tu jî wekî Heso li te hatiye lawo Misto.

Bi babidestî serî dihejand:

- Hoo... weh. Çi bênamûs ji pişta min ketine lo.

Diya wî ew, di nav gazinan de, dihişt:

- Bixwên lawo bixwên. Bi Xwedê te em merezî kirin lo. Heta vir...

Perçeyekî din ji laşê Misto dawerivî. Xwe, di nav bazara zebeşan de, dît. Li kemencê germ bûbû. Hawîrdorên wî mişt qîz bûn. Di bin simbêlan re dikeniya:

- Çi qas qîz pirr in lo.

Piştî çend sal derbas bûn, weha gotinên wî jî pê re hatin guhertin:

- Çi qas qîz pirr in, hewqas hindik in jî. Ew kî bû digot; jin hene û jinkok hene. Lê çima şensê min tim li jinkokan rast tê, ez nizanim.

**EMÎNA**

Kezeb lê reş bû, heta ku Emîna anî mal. Nû wê hembêz kir, kabokên wê li hev ketin û lerizîn:

- Emîna... çi bi te hat, çi bû?

Rûzer û çirmisî got:

- Ez ditirsim.

Misto lempe vemirand. Fêde nekir, rabû ser xwe, fêde nekir. Li ber geriya, fêde nekir. Hema rabû û xwe tazî kir. Emîna jî kabok lê bêhtir lerizîn û dest bi girî kir.

Ew cara dawî bû ku rûyê Emîna dibîne.

**CEMÎLA**

Kêfa xwe pirr ji Misto re anî. Wî jî hêdî hêdî, xwe nêzîkî wê kir. Heta rojekê rahişt destê wê. Cemîla veciniqî. Keniya û rûsor bû. Têgihişt Misto çi dixwaze. Serî hejand:

- Xem nake... Sibe ez ê bêm cem te.

Bû sibe... Cemîla hat.

Lê xortek qelew û dirêj pê re bû:

- Ev kî ye îca?

Cemîla bi ken lê vegerand:

- Ev destgirtiyê min e.

Beroşek ava sar bi ser serê Misto de rijiya.

**FERÎDE**

Du mehê dûvedirêj ji Misto hezkir. Xwe dikir bi heyrana wî, wî jî li kemencê dixist. Geh jî distira. Lê destpêka meha sisayan Ferîde jê re got:

- Ez nema ji te hez dikim.

Misto dîn bû. Eman, zeman, hewar.

Bi pozbilindî gotina xwe berdewam kir:

- Ev dilê min e û ez azad im.

Misto li ber rûnişt. Lingê wê ramûsand. Kela girî kete qirikê. Rih dirêj kir. Xew lê bû hesret, bû ta û derzî.

Ferîde niha bi serê lêvan silavê li Misto dike yan nake.

**ZEYNEB**

Roja yekem Misto nas kir û jê hezkir. Roja dudiyan ji Misto re got:

- Ezê, heta mirinê, ji te hez bikim.

Roja sisiya Misto bihîst ku Zeyneb yek revaniyed. Şivek tûj li serê pozê wî ket.

**ŞÊRÎN**

Misto dabû dû Şêrînê, gula qîzên kurd li zanîngehê. Ji ber ku yên xweşik di nav wan de gelekî kêm bûn, du sed xortî bi hev re didan dû Şêrînê. Mistoyê zexel jî yek ji wan bû. Piraniya wan yan kinik, yan reşik, yan jî xwînsar bûn. Nalenala Misto bû:

- Tirên li orta me qelibî.

Rojekê ew û Şêrîn li hêviya postakê bûn. Dema Misto xwe ji bo silavê amade kir, Şêrîn berê xwe guhert:

- Tifû... Li bextê reş, şensê pîs.

Poste hat, mişt bû. Misto rûnişt, Şêrîn ji piya ma. Ji ber wê rabû, dengekî nizim û birûmet jê herikî:

- Fermo Şêrîn.. rûne.

Şêrîn bilez ji postê daket.

Li sînema zanîngehê cih tune bû. Cihek tenê vala li cem Misto hebû. Şêrîn hat, gul li ser rûyê Misto şîn hatin. Çare tune, divê li cem wî rûne. Lê, Şêrîn ji piya ma û rûnenişt. Misto jî bi îbrî û

yûnanî dest bi xeber û sixêfan kir. Herweha qîzek bi dû qîzekê ve ji ezmanê dilê wî hildiweşiyan û her carê jî kula Bêmalê mezintir û girantir dibû. Di wê baweriyê de bû ku evîn û mirin yek in. Her du carekê tenê tên. Bîranînên wî keliyan. Keliyan heta ku...

Perçeyekî din ji laşê Misto dawerivî. Pîrika wî "Fatê" hate bîra wî, dema çîrokên evînê jêre digotin: (Hesenê mala Mûsa ez te nakim. Tu bi gul û endeko bî, li nava biharê, ez pêl te nakim. Tu bi werîsê şala bî, ez bi te barê xwe bar nakim.

Te dît lawo Misto ku jin ji mêr hez neke û mêr jê hez bike, ew mêr xwe bikuje jê re çêtir e.)

Bêmalê hat bîra wî û bû gumîna agir di dilê wî yê şewitî de.

Çîroka dina pîrika wî ev bû:

(Pismam dotmam dixwest. Dotmamê jî çû yekî xwe kir. Wî jî jinek anî. Dotmam bi poşmanî digot:

*"Tivinga lawikê min nesranî*
*Min berda kelê, kel hilnanî*
*Ne mêrê min kir,*
*û ne jina ku te anî.")*

Dîsa hat bîra wî, dema Bêmalê por berdida. Sed şax li ser piyan şîn dihatin. Carekê jî Bêmalê sînga xwe jê re vekir, dused kevok jê firiyan. Lê cara ku destê xwe vekir "Bye.. Bye" sêsed kêr di dilê wî de çand. Niha jî dilê wî xwest ku helbestekê li ser wê saz bike:

*Bêmalê/*
*te ez kirim bêmal /*
*ez hiştim zuxurek kevin li çiyayekî ku gur tenê lê hene /*
*lê çi bikim /*
*ez û ev kemence ne /*
*ne tilî bi min ve man /*
*ne jî têl bi kemencê ve man.*

Misto xwe bi tenê dît. Hevalên wî xwendin qedandin. Ê ku bû mamoste, ê ku bû bijîşk, ê ku bû parêzer. Bûn xwedî jin û

mal. Hinek jî li serê çiyan bûn pakrewan û hinek bûn pêşmerge. Çerxa demê lê fitilî û li şûn ma. Hîn xort bû, girêkên mirinê ew kiribûn xaniyekî bêxwedî û riziyayî.

Vê gavê...

Perçeyê dawî ji laş û canê Misto dawerivî.

Xwediya çavên reş û xilmaş, ya qata pênca, li hêviya dengê kemencê dîn bûbû. Dikir ku xwe bixwe. Sê rojan, ne dengê kemencê, ne jî dengê lingê xwediyê wê, nehat. Bi bêhneke teng derket devê derî. Bêhna dûmanê kir. Beziya çû jor. Li derî xist. Kes nehat. Bêhna dûmanê bilind dibû. Heta jê hat qîriya:

- Agir bi qata şeşan ketiye, agir.

Xelkên avahiyê tev civiyan û bazdan ber bi qata şeşan ve. Derî şikenandin û ketin hundir. Her du çavên reş û xilmaş mat man. Xelk tev behitîn:

- Xaniyekî vala û bêdeng.

Li jêr kemence bûbû kulmek arî.

Li jor jî dûmaneke tarî, bi kerb dilîst. Bi vekirina derî re dûman derbasî poz û dev û çavên xelkê bû. Bû kuxte kuxta wan û zarokên wan. Kuxte kuxt kete nav cîranan, kete nav taxê, nav bajêr, nav gundan. Bû kuxte kuxta miriyê mezelan.

## MIRÎ RANAZIN

**Li Şermola**

Şermola: Goristan e. Navê girekî herifî ye, li kêleka mezelê Amûdê.

**ŞERMOLA**

Nebêjin ez komeke ax im û hew. Ez şitlek ji axa herifî me. Zeman ez di vir de çandim. Mîna guhekî me. Guhekî mezin im, tev ku ez bi gor û hestiyên miriyan pêçayî me. Lê şaxên min di kûrahiya dîrok û demê de cih girtine. Ez ji cih nalivim. Narim cem tu kesî. Xelk yeko yeko koça xwe bar dikin û dibin mêvanê axa min. Heval û hogirên wî, bi destên xwe, wî dispêrin reşî û dijwariya axa min. Dengê diyan xweş tê min, dema ji zarokên xwe hêrs dibin “Wey ez te, di Şermola de sax veşêrim Iawo.” Bi laşên we axa min dixemile. Lê, her laşekî nû tê, bi hezaran kul û derdan bi dû xwe de diweşîne. Erê, hûnê bên cem min. Ez nayêm cem we, hûn jî li min napirsin. Berî sedê salan, kalemêrek di nav we de hebû. Li çûn û hatinê digot “Kerbeş divêt kerê reş, qedrê gulê çi zanî.” Gul dibe ku ezbim, yan mirin be. Hûn di guhê gê de ne. Hûn miriyên xwe dispêrin min û wan ji bîr dikin, bê ku hûn zanibin ku carinan civatê miriyan digerînim û bi wan

re govendê dikim. Pêkenokên li ser we zindiyan dibêjin. Bi hev re, em bi rewşa we dikenin. Geh jî bi pergala we digrîn. Pirsekê tenê di dilê min de zîl daye. Kî ji we dimre, wî yan wê di sînga min de vedişêrin, lê gelo we tu carî pirsî ye. Eger ku Şermola bixwe bimre, wê kî sînga xwe ji cendekê wê re veke. Wê kî min di hembêza xwe de veşêre?

## NIVÎSKAREKÎ MIRÎ

Şermola ev e. Geh bi hezkirineke mezin li ser xelkên hawîrdora xwe dipeyive. Geh bi hêrseke xurt û bêserî rewşa wan tîne zimên. Lê tu carî Şermola xwe ji pala bajarê Amûdê nedaye alî. Bi hezar salan, ev girê pîroz bûye balîf. Amûdê jî weke jineke spehî, lê di payîza temenê xwe de, pişta xwe daye vê balîfa nerm. Nifşekî ji xelkên xwe vedişêrin, heta dora nifşê din bê. Wisa ewrên êşên giran ji zik ezmanê Amûda kor xwe nedidan kêlekê. Amûda şewitî, Şermola bilindtir dibû. Serê wî tim di nav ewran de, qelşên dirêj vedikirin. Bi sed salane ku ew li me guhdarî dike. De ka em guhê xwe hinekî deynin ser sînga Şermola, bê ka li ser rewşa zindî û miriyên me wê çi ji me re bêje. Ji ber ku tiştên ku ew bêje nayê gotin. Tiştê ku dîtiye tu kesî nedîtiye. Niha wê me bibe cîhaneke nû. Ne ya zindiyane, ne jî ya miriyane. Her tişt tevlîhev e. Mirin û jiyan, şîn û kêf, hebûn û tunebûn tev de wekî hev in. Cîhana xelkên Şermola dojehî ye, rengîne, reş di kesk de winda dibe. Sor tevlî şîne. Spî di zer de şîn tê. Reng hevdu dixwin. Xelk hevdu dixwin. Lawir li hevdu siwar dibin. Zarok porspîne. Pîr û kal ji qîzên şeş heft salî re dibûn mêr. Dinya xera dibe. Xelk li bendî baranê ne, lê ziman û penc û diran ji ezman dibarin her tiştî didin ber xwe û dest bi derew û gez û ken û kuştin û dawetan dikin û kî mêre ku nekeve vê xelekê. Vê çerxa ku berevajî û vala digere.

## Reşikê Şevê

“Çawa Hemîdo bû lawir”

Hemîdo bavê Şêxo ye. Berî bimre bi çend salan bi nexweşiyekê ket. Heta niha kes navê wê nizane. Ji nişkê ve ji xew vediciniqe û dike hewar:

- Reşikên şevê hatin min. Reşikê şevê, aaaax.

Dema ku şiyar dibe, carina laşê wî dilerize û hêsir ji çavên wî dipijiqin:

- Ez ditirsim, ditirsim.

Newêrîbû derketa ber derî ji tirsa kêr, tiving û şûrên ku li ber çavên wî kom dibûn. Hemû di nav hev de direqisîn:

- Binere, binere, govenda tivinga ye.

Ji lempe û têlên kehrebê dîn dibû:

- Xwedê vê tirsê bi serê gurê çiyê de neşîne lawo.

Karê diya Şêxo girî bû. Piştî ku dermanê bijîşkan fêde nekir. Berî demeke dirêj şûr simbêlê Hemîdo ne dibirî. Gumegum ji lingan dihat. Cara dawî di nav destên wan de dikeniya:

- Reşikê şevê… Reşikê şevê. Reşikno herin xortan bigrin. Tayekî reş di porê min de nemaye, hîn jî hûn….

Xwedê mala we biveritîne.

Piştî heft mehan şandin dû Şêxo:

- Were bavê xwe bibe.

Ew anîn. Mabû nîv mirov. Rûyê wî qermiçî û zer bûbû. Ling lê şînkirîbûn. Hema dest digiha laşê wî, dikir ahîn. Deverek sax û bê êş, di laşê wî de, peyda nedibû:

- Xem nake bavo, çend roj in û ev êş wê here. Xem nake, lê her ku roj diçûn êş zêdetir dibû.

Qîr dikir jina xwe:

- Kanî Şêxo?...

- Va ye hecî, va ye.

Çavên xwe digirtin û devê xwe vedikir. Zimanê wî axa jiyana wî, ya ji berî deh salan ve, dikola.

(Li "Serxetê" dema min "Cemo" revand. Tu Cemo nas dikî, ne?

Cemîla ya çavgawir, qîza apê min. Spehiya qîzên Omeriyan. Bêbavê xweşikbûn ji kesî re nehiştibû. Bejinzirav, rûken û por li noqê, çavreş û kilkirî. Hema tu ne bixwî û ne vexwî, ji xwe re lê binêrî. Min jê re got:Cemo, tu dotmama min î û divê tu ji min re bî. Got were min bixwaze. Min jî bawer kir. Gava me xwest, apê min, bavê wê gelekî zengîn bû, eşkere bersiva me da:

-Ez qîza xwe nadim yekî xizan. Tev ku tu pismamê wê ye jî. Lê mîh bi lingê xwe ye û bizin bi lingê xwe ye. Min jî yek nekir dido. Carekê Cemo li nav rez li cem paleyên kesaxê bû. Min bi çepilê wê girt û ew avêt ser hespê serreş û min ling li bin zikê hespa rewan xistin. Em tibabekî dûr ketin. Destpêkê rûyê Cemo zer bûbû. Maddayî bû. Lê piştî çîrok nas kir, keniya. Min bawer kir ku ji kêfan re dikene. Di nav henekan re ji min re got; Pismamo ez tî me. Ka em avê ji cem van kesan vexwin. Bi rastî ez tirsiyam. Wê rê li min girt; netirse em ê bêjin em jin û mêr in. Gava ez ji ser hespî daketim da ez avê vexwim, Cemoya bêbext xwe avêt pişt wan mêran û kir hewar. Vî mêrikî ez bi darê zorê revandime. Ez di bextê we de. Bênamûsan, te digot qey berê amade ne. Wek deh kûçikên har, li min civiyan. Bi zor û heft bela, min xwe ji destên wan rizgar kir. Cemo çû. Hesp çû. Apê min, eger min bigre ew avê li canê min venaxwe, wê min bike fîşekek. Dem li ber rojava bû. Min wilo ji xwe re got; ku reşî têkeve erdê çêtir e. Min berê xwe da Binxetê. min zanibû ku bi sedan bombe û mayîn

li ser rê çandine. Leşkerên bêwijdan di kozikên xwe de ne. Wê çaxê ev lempeyên ku niha li sînor rêz kirine, tunebûn. Ne dihiştin ti kes derbas be, ji pêvî hinek qaçaxçiyan bi zora xwe yan jî pere di devên wan de radikirin. Ez mam li hêviya kerwanekî qaçaxçiyan, lê wan ez bi xwe re nekirim heval. Min mirina xwe xist destê xwe û xwe bilez li sînor xist. Teqereqa qurçîn û tivingan ji guhê min nediket. Fîzîniya fîşekan bû ku tîrêj di reşahiya ezman de vedikirin. Agirê wan ji dora serê min qut nedibû. Min jî berdewam kir. Erê, dibêjin bazdan nîvê mêraniyê ye. Carcaran min xwe bi zik ve davêt erda bi stirî û kevir. Bombe li aliyekî bûn, leşker li aliyê din û ez jî di nav wan de, tî, qiriktal û zuha û xwas mabûm. Ji nişkê ve, kevirekî tûj ji ber tiliya min bilind bû û qerpînî ji çoga min hat. Wek tu ji xwe re textekî bişkînî. Min got qey lingê min bû du perçe. Kevir di hestiyê birçî de çikiya. Qêrîna kûçikekî ji min çû. Xwêdan tevlî xwîn û ahînê bû. Ez bi ser dev de ketim. Min got qey diranên min tev hilweşiyan. Lê, di kezeba tariya şeva reş de, çirayên Amûdê vêketîbûn. Gava ji min ve xuyakirin, hinekî dilşa bûm. Min naskir ku min rê li xwe dirêj kiriye. Nema dizanim dûv re çi bû. Dema min çavên xwe vekirin, min dît ku ez li mala ciwamêrekî me. Bi hilatina roka sibehê re, şivanekî cendekê min kişandibû mala xwe. Ez bi nan û av kirim:

- Şêxoo.. ka qedehek av. Qirka min zuha bû.

Rebenê Şêxo amade bû. Piyal da dest, vexwar. Li jor nêrî û dîsa berdewam kir:

- Birînên min girêdan. Min serê xwe danî û ketim xeweke giran.)

Dema wilo got, her du çavên xwe girtin û kete xeweke giran. Carên berê ku bîranînên wî tev radibûn, bi kurtî dipeyivî, lê vê carê dirêj kir. Kerş û gemara salan tev de dabû ber xwe. Şêxo jî guhertinên ku di rûyê bavê wî de çêdibûn didîtin. Rûyê wî zertir dibû. Dirêj dibû. Tiştê ne normal guhên wî bûn. Roj bi roj dirêj û pan dibûn. Destê xwe danî ser jêra pişta xwe û got:

- Pizikeke mezin di pişta min de şîn tê.

Jina wî destê xwe dayê:

- Lawo Şêxo werimiye.

Şiyar bû û kir nalîn. Rawestiya û bêdeng ma. Dîsa di derya bîranînên xwe de winda bû. Şêxo nema dizanîbû ku bavê wî xewnên xwe dibêje, yan bûyerên jiyana xwe şiyar dike. Ji neçarî, guhên xwe pêl dikirin û deng jê nedihat:

- Erê lawo, her tişt nayê bawer kirin. Berî ez Cemo birevînim, min deh berbejn û devgirêdan çêkirin, da ku dest li ber min hilneyne. Nû destê min giha destê wê, hema min dît, bi alîkariya Xwedê û wan niviştan, wekî ku bask pê ve şîn bên, ji erdê bilind bû. Min çavê xwe girt û vekir, min dît ku ez ji gund û rez û paleyan, dûr ketime. Hespê min bi du baskên fireh û mezin firiya. Xelk biçûçik xuyabûn û ji jor ve dar xweşiktir bûn. Bayê serê çiyan hênik dihat. Serbilind bûm. Heta mirinê, ez wan kêlîkan ji bîr nakim. Bera Xwedê mala dilê yekem, dilê ewilî, xera bike. Lê, ya rast, gava ew tiştê xerab ket dilê min û destên min li bejna dotmama min hatin pêçandin, qencên Xwedê xwe ji ber min dan alî û Cemo xistin nav destên wan kesan. Min hema xwe dît ku li Binxetê me û şûtûrût im. Berê dinya ji aniha xweştir bû. Hewqas girr û kîn di dilan de tune bû. Niha kes ji kesî hez nake. Yek xêrê ji yekî re naxwaze. Her yek li ber a xwe ye.

"Cara yekem bavê me Adem diya me Hawa dît, yan jî pêrgî wê hat û jê ve nêzîk bû, berf li erdê bû. Adem pişta wê danî ser berfê û ket ser sînga wê. Hawa gotê; sare, ji serma pişt bi min ve nema. Adem lê vegerand; Cihê zikê min germe, îşê min çi ji pişta te ye."

Ev jî em in. Min dest bi kar kir, ji bo geppa nan, bûm şivanê xelkê. Bûm gavan. Min liqat kir û bênder dêran. Heta çend mecîdî, qirûş, min dan ser hev û min pê piskilêtek kirî, kezeba min reş bû. Wê demê piskilêt bi qedir bûn. Min çewalên mişt ka min lê siwar dikirin û bi peya berî dida bazara Qamişlo. Carekê, di kelkela germa havînê de, teker teqiya û ka tev de rijiya. Hema min çixat ji

bêrîka xwe derxist, li dewsa ku ez çixarê vêxim, min agir bi kayê xist û min piskilêt avêt nav. Agir gurr bû û destvala vegeriyam mal. Erê lawo, bi qiriktalî, min ev mal avakir. Apê min jî fermana bavê min (Sofî Silo) ji Serxetê rakir. Hat di nav van dîwarên ku min bi xwîna xwe bilind kiribûn de, rûnişt. Bi şev û roj Quran dixwend. Jiyana wî ev bû. Hat bîra Şêxo, gava mala xwe ava kirin, bavê wî li jora xanî hestiyekî rût ê qehfekî keran daleqand û got:

-Ji bo kes mala me çavînî neke. Çavê hineka ji topan xerabtire.

Li ber her deriyekî ayeteke Quranê bi hevîr li dîwêr xist, pêre jî pistepista wî bilind dibû. Xwedê me ji zikreş û çavsoran biparêze. Ev tev de li aliyekî û çavsoriya reşikê şevê li aliyekî din. Nizanim lawo Şêxo, ez dikim nakim, kêfa min ji van kûçikbavan re nayê.

- Kî yabo, kî?

Şêxo wilo got û bala wî çû ser reşikên şevê, lê vê carê leşkerbûn:

-Ne leşkerên Serxetê, ne jî yên Binxetê bûn. Lê, axxx bes ku min bi zimanê wan zanîba. Vê cara dawî, li ser sînor, di “qapî”re, ez çûm Serxetê. Evên Binxetê bi min re peyivîn, min nizanîbû çi dixwazin, ji nişkê ve şirqînî ji rûyê min hat. Ez çi qas li ber xwe ketim lawo, ev riha min a spî û zarokekî ku duh ji diya xwe ketiye, wilo li min kir. Ronî di çavê min de nema. Heta Xwedê hêz da min, min jî şeqamek pê ve kir. Hevalên wî li me civiyan û ez bi dû xwe de kişandim. Piştî nîvê malê bi min re, ji xwe re birin, ez berdam. Bi dû de yên “Serxetê” ez sekinandim, li pasport û firaxên min nerîn. Kir qerebalix, ez têgihiştim ku xeberan dide. Bi dû ku ji min re got; ev çiye, min got; ez nizanim bi zimanê we bipeyivim. Ez dihatim ku ji çermê xwe derkevim. Min rahişt firaxan û ez meşiyam, wî ji paş ve bi çakêtê min girt. Ez lê zîvirîm û min teneka rûn di nav serê wî de pelixand. Dest avêtin demançan û bû qîrewîra wan û min nema xwe dît. Heta birayê min hat ez ji hebsa Nisêbînê derxistim. Nizanim çima Xwedê em bê welat, bê rûmet û rezîl berdane vê dinyayê.

Reşikê şevê hat.. hawawawa..

Cilê leşkeran lêbû. Ev leşker agir in û Xwedê wan berdaye mala me. Ne kêf, ne xweşî, ne rûmet, li nav me nehiştine. Çawa Xwedê vê zorê dipejirîne, ez nizanim. Xwedêyo li min negir, em çi gunehkarin lo. Van hiştiye bi zorê yek ji çermê xwe derkeve û rê şaş bike. Laşê wî tev lerizî û lêvên wî zuha man. Şêxo veciniqî û bi her du destan girt:

- Yabo... yabo.. çi bû?

- Reşik lawo, leşkerên reş, dernekevin devê derî. Ji bo Xwedê wê we bikujin, hatin, hatin.

Giriyê diya wî bilindtir bû û pê ve rabû.

-Hecî.. Hecî, ev ez im.

Hecî di nav destên wan de sistbû. Di xew re çû. Girî li diya Şêxo zor kir. Xwe avête kêleka mêrê xwe û bi dengekî bi şewat û nizim dîlokên xwe gotin:

*Lo lo lo lawo*

*Xerîbo lo lawo*

*Rebeno lo lawo*

*Wey li min û li vî dilî*

*Heyfa delalîkê dilêm*

*Heyfa destên wekî şaxan*

*Ku îro tev man bê tilî*

*Lolo lo lawo*

*Sermiyano lo lawo*

*Bextreşo lo lawo*

*Sermiyanê mala bavê mino lo lawo.*

Şêxo nizanîbû diya wî li ser kê dike ahîn. Gelo ew li ser bavê wî, xalê wî, yan li ser xwe bextreşê dibêje. Ji gava ku bîr biriye, heta niha, di xizmeta mêr û zarokên xwe de ye. Ji berî çil pêncî salî ve Gotina "Na" nehatiye ser zimanê wê. Carekê jî destê xwe li zarokekî hilnedaye. Zor li kîjan zarokê tê, dibeze cem wê:

- Yadê, ez di bextê te de.

Diya Şêxo ji dê û bavên xwe qut bûbû. Nediçûn cem hev, ji pêvî rojên cejnan û rojên nexweşiyên giran. Temenê xwe, di xizmeta mala xwe de, derbas dike. Bi xwe zanîbû ku tu jin li şûna wê debar nakin. Karên pir, cirra hecî, xeyda wî, xeberên wî. Tev ku Hecî bixwe, li nav xelkê, perîşan bû. Sê caran çû hecê, hîn jî kêm kes jê re dibêjin Hecî. Teva bi navê –Hemîdo û ne“Ebdulhemîd” bang wî dikirin. Hecî destgirtî bû. Bi ya xwe tenê dikir. Serhişk bû, lê vê nexweşiyê pişt lê şikandibû. Bijîşkan tiştek jê re, nedigotin. Şêxo dihat ku dev li xwe bike. Madê bavê wî dihat guhertin. Lingê wî zirav dibûn. Guhên wî dirêjtir dibûn. Rojekê, zarokekî li ber Şêxo ji diya xwe re got:

- Yadê xalê Hemîdo bûye wek kûçik.

Diya wî şeqamek pê ve kir.

Şêxo nema hişt ku mêvan bên ber serê bavê wî. Rê li bijîşkan birrî. Nalîna bav zêdetir dibû. Gelek kes nexweş diketin, lê kesî bawer nedikir ku rewşeke wisa seyr bi ser bavê wî de bê. Rojekê serê sibê, Şêxo bi ahîna bavê xwe re şiyar bû:

- Pişta min çû lawo... axxx pişta min.

Şêxo mitêl hilda, çavên wî çûn nîvê eniyê. Teriyeke dirêj û qalind bi dawiya wî ve şîn hatibû. Guhên wî bûbûn mîna du pelên darê. Zer û bi pûrt. Mûyan laşê wî veşartibûn. Poz dirêj bûbû. Nema deng jê dihat. Dema diya wî ev rewş dît, ji qama xwe ve hate xwarê û ji ser hiş çû. Şêxo dest bi giriyekî bêdeng kir. Hêdî hêdî bavê wî li ser çar piyan ji hundir derket û li derûdora xwe dinêrî. Gava guhên xwe miç dikirin, Şêxo bitirs lê dinerî. Ne kûçik bû û ne ker, lawirekî di wê ortê de bû. Lê awirên wî wek awirên Hemîdo bûn. Şêxo bêhiş da dû. Bav berê xwe da Şermola û beziya. Şêxo vegeriya, diya xwe şiyar kir. Rûyê xwe şûşt, naskir ku ne xewne. Ramanekê li serî xist “Ev lawir canê bavê min, giyanê wî ye, laşê wî jî çû ber dilovaniya Xwedê. Bi xwe hisiya ku tevlihev dike û tiştan baş ji hevdu dernaxîne. Serê wî gêj dibû.

Di wan rojan de, “Îsko” kûçik dikuştin. Geh bi tivingê, geh jî bi nanê jehrkirî. Ji ber ku fermana kûçikan li bajêr rabûbû û di raporên fermî yên dewletê de wisa hatibû nivîsandin.

Ji bo parastina mafê mirovan

Parastina mirîşkên gel

Parastina kîvroşkên welat

Em vê biryarê dadixînin holê û em sozê bi gel û dîrokê re didin ku em kûçikekî li ser ling nehêlin.

Bijî...

Bijî...

Bimre kûçik.

Çi qasî Îska ew dikuştin, ew qasî pirrtir dibûn. Nediqeliyan. Her dêlikek dikuşt deh, duwazde cewrik çaralî dibeziyan. Wan jî li ber xwe dida û her rojê mirîşk û kîvroşkên malekê dixwarin. Heta ku wan êş li Îska xist. Îska mir û kûçik mezin bûn. Dema ev raman diserê Şêxo re çûn û hatin; “Ditirsim îska wî jî bikuje” ji diya xwe re got:

- Yadê, bavê min nexwest laşê xwe bike bela serê me, ew canê wî bû ê ku bi rengê lawirekî ji mala me derket serê sibê. Divê em tabûtekê jê re çêkin. Ji bo ku xelk zanibin ku bavê min, wek hemû miriyan, bû mêvanê Şermola.

Di wê rojê de Şêxo hemû tiştên pêwîst ji bo miriyekî amade kir. Du balîfên giran, di tabûtê de raxislin û ji xelkê re got:

- Min bavê xwe şûşt, ne hewcî mellaye.

Tabût birin mizgeftê. Melleyê mizgefta mezin bang nimêjkiran kir:

- Ehlê xêrê, Hecî Hemîd çû ber dilovaniya Xwedê. Va me aniye mizgeftê, ê bixwaze li ser nimêj bike, bila bê mizgeftê.

Pê re, pê re xelk kom bûn. Bi dû hev de, nimêj kirin. Bû pistepista wan bi dû tabûtê de “Em ji Xweda re ne û em ê lê vegerin.” Çar ketin bin tabûtê û bi dorê, heta gihiştin Şermola. Xelk tev

rêz bûbûn. Hesenê Gunreş gor veda bû. Gelekan silav lê dikirin. Xwedê zane bê ev çend salin ku ev ciwamêr vî karî dike. Xwedê zane bê gorên çend mirovan, bi destên xwe, vedane. Şêxo nedihişt ti kes nêzîkî tabûtê bibe. Wî bi xwe tabût daxist gorê û bi hev re ax bi ser de kom kirin. Hinek digiriyan, hinek dikeniyan û hinek ketibûn nav deryaya biranînên xwe bi Hemîdo re, dema wekî wan, sax bû. Tev de bi xwe daketibûn. Li kêleka girê Şermola lawirek rawestiya bû û bi du çavên tijî pirs li xelkê dinêrî. Kesên wî didîtin ,di navbera kûçik û ker û rovî û hinek mirovan de, şaş dibûn. Zêdeyî carekê dihat gotin:

- Awirên vî lawirî ê mêrane.

Zarokan kevir lê dibarandin:

- Kûçik lawê keran.

- Ker lawê kûçikan.

- Rovî lawê pisîkan.

Şêxo û diya xwe konê reş vegirtin. Pênc rojan bin kon ji mêvanan vala nebû. Zarok û xal û ap û bira û xwarzê û birazî tev li nav hev ketibûn. Her pêncşem, mîna xelkên zindî tevan yên ku diçûn ser miriyên xwe, ew jî diçû Şermola. Wî lawirî, ji dûr ve, li Şêxo û diya wî dinêrî, dibeziya û xwe vedişart, laşê Şêxo dilerizî û diket derya ya tevzînokan. Destê diya wî tim ber bi jor ve bûn:

- Xwedêyo, tu me ji a mezintir biparêzî.

Carekê diya wî çîroka vê gotinê jê re got. Mirovekî gundî di ber çem re dimeşiya. Seriyekî jêkirî dît. Her du lêvên wî ji hev vedibûn:

- Xwedê me biparêze ji a mezintir.

Evê gundî mat ma. Gelo çi ji vê yekê mezintir heye. Serî û jêbûye. Gewde û nexuyaye. Hîn ji ramana xwe şiyar nebûbû, ew serî herikî nav avê û pêlan ew bilind kirin. Ji nişkê ve serî li kevirekî ket û ji hev belawela bû. Wê demê ê gundî naskir ku a mezintir çiye. A niha herkes li ser miriyên xwe digirî. A rasttir ew e ku her yek bi halê xwe digirî û dilê wî pê dişewite. Şêxo jî

bêpêjin li hawîrdora xwe dinêrî. Çavên wî tije av dibûn, ava tirs û belengaziyê. Berevajî çavên diya wî ku zuha diman. Zuhabûna temenekî bi tozê pêçayî. Li çaraliyên mirî û zindiyan, bahozê stûnên tozê bilind kirin. Yeko yeko zindî vegeriyan malên xwe. Hevalên şevê şûna wan girtin. Xwediyê şûşe û piyalên tijî kul û derd, parsek û kesên bêwar, mêrên mîh û kerên mê, berê xwe didan goristanê. Mezel bibû ware diz û miriyan, bibû cihê keçikên ku piştên xwe didan kelên goran û xortên enî qermiçî dixistin hemêza xwe. Jinên bî û yên ku mêrên wan ji wan dûr, kalên li pey qîzên biçûk, jinên ku hember pere û "nanûzikê" lingên xwe hildidan û agirê xweşî û gunehkariyê laşên wan dişewitand, ev tev de li hêlekê û mirî û civat û dîlan û pêkenok û girî û gazin û hewar hewar li hêleke din. Şermola bi şev dibû kewara mêşên gêj û bê hingiv, mêşên mezin û qelew, yên sax û mirî. Qenc û xerabên Amûdê digindirîn ber lingên Şermola:

- Amûdê, bera agir bi te keve. Tu bişewitî.

Şêxo, li riya vegerê, nifir dikirin. Ji wê rojê ve gelek dibêjin ku Şêxo dîn bûye. Her aciz dibe Amûdê di nav xeberan de dihêle:

- Wey tu biqurmiçî Amûdê. Tu bimrî. Ez te di Şermola de veşêrim.

Ji wê rojê ve, her ji çend şevan carekê, Hemîdo diket pêşiya zindiyên ku carekê ji caran ew di saxiya wî de, aciz kiribûn. Ew ditirsandin. Xelkê jî tevan dizanîbû ku Hemîdo bi xwe bûye Reşikê Şevê.

## Dilê Bêderî

Mirina bavê Şêxo jê re bû gerînok. Nîvê şevê ji xew vediciniqî, didît ku bavê wî, wî dixwe. Her şev, her ku çavên xwe digre bavê wî tê wî dixwe. Dikeve rengê lawirekî mezin û pencên wî dirêjî çav û rû û sînga Şêxo dibin. Wî zîvar zîvarî dikin. Dike hewar, lê ti deng jê dernayê. Dike û nake dengê wî dernakeve. Li ser qêrîna diya xwe ji xew dipengize. Bilez ber bi Şermola ve direve. Şevekê li bavê xwe rast hat. Her du ji hev du tirsiyan. Lawir paş ve vegeriya, dengê kesereke dirêj jê hat û di nav tariya şevê û kêlên goran de winda bû. Şêxo dest bi girî kir. Heta Xwedê hêz dabûyê kir qêrîn:

- Yaboooo...

Bi gotina yabo re mirî lê civiyan. Her miriyekî serê xwe ji axê dadiweşand û bi xwe re dipeyivî. Şêxo tev de nas dikirin. Ji dilekî germ dikir gazî:

- Ji bo Xwedê. Ev xewne, yan hûn birra ji mirinê şiyar bûne?

Miriyekî kal keniya:

- Kurro qey te ji bîrkir ku tu li Şermola yî?

- Na, lê ez dizanim ku mirî ranabin, tim razayî ne.

Tiqetiqa miriyan bilindtir bû.

- Mirî li Şermola ranazin, bera ji îro pê de tu jî yek ji me bî, serseran.

- Gelo ez jî mirî me, ez bi xwe nizanim?

- Na, na, niha vegere malê û te kengî xwest were cem me.

Di kêlîkekê de gor, mîna şikeftên biçûçik, tev de vebûn. Bi dû windabûna miriyan de, gor vegeriyan rengê xwe yê berê. Şêxo zîvirî, çavên wî ketin her du çavên bavê wî yên mişt av. Lawir mat mabû, serê xwe ji Şêxo re hejand û çû. Li male xwêdanek Şêxo diçû, yek dihat. Diya wî, mîna mûmekê, dadiwerivî. Rojê hinek goşt jê kêm dibû. Piştî hefteyekê Şêxo bûbû benîştê devê xelkê. Şêxo bi xwe re dipeyive. Nîvê şevê bi tenê diçe Şermola. Bûye hevalê miriyan, dibêje ku wan dibîne û zane bi zimanê wan:

- Ha ha ha ha, jixwe ew ji dînan kêm maye.

Rewşa diya wî dijwartir dibû, xwarin kêm dixwar û nalîna wê bû:

- Axx.. pişta min dêşe... Pişta min.

Hate bîra wî ku malbata wan tev de bi êşa piştê çûne gorê. Heryekî bigota pişta min, dizanîbûn ku mirina wî nêzîk bûye. Xweşik, bala xwe da diya xwe. Tirsiya ku ew jî di rengê lawiran keve. Lê her bi her gewdeyê diya wî biçûçiktir dibû. Pûrteke spî li çermê wê peyda dibû. Pûrt dirêjtir û hişktir dibû. Şêxo li nav hev ketibû. Ti kesî nizanîbû çi pê hatiye. Her şev diçû cem bavê xwe. Li kêleka mezel radiwestiya. Ew lawir hêdî hêdî ji pişt girê Şermola derdiket, li ser teriya xwe rûdinişt û li Şêxo guhdarî dikir:

- Yabo ev çi li dora min dibe? Ez nema tiştekî ji hev derdixim.

Çermê lawir piçik piçik diçiriya. Şêxo dilerizî. Ji nişkê ve bavê wî li cem rûnişt. Çermê xwe kir wekî kurk û avêt ser pişta xwe:

- Lawo metirse, em mirî ji van zindiyan çêtir in. Rewşa me xweştir e. Dawet, kêf, dîlan, şevbuhêrkên ku ti carî min nedîtibûn, ez li vir dibînim.

- Yabo ez jî dixwazim bimirim.

- Na, temen di destê Xwedê de ye. Lê min bêriya diya te kiriye. Lawo wê qiriktalê, ti xweşî di jiyana xwe de nedît.

- Diya min nexweş e.

- Ez zanim, wê di demeke nêzîk de bê cem min.

- Yabo ez bûme wekî dînan. Xelk tev de wilo dibêjin.

- Xem nake lawê min, ev tişt ji bo te baş e. Sibe wê hevalê te jî çê bibin.

Xiştexişta lingekî hat. Şêxo ji dûr ve mêrek dît. Bavê wî keniya û rabû ser xwe:

- Hemdînê serxweş e, her şev tê serê xwe datîne ser gora Zeyno û digirî, jinik jî tim li nav miriyan henekê xwe pê dike. Tê, her şev hinekî ji erda cem gora wê dikole û dibêje; ev gora min e. Dixwaze piştî ku bimre jî li kêleka wê be. Ev dil çi mirov şerpeze û bêrûmet dike lo.

Şêxo ketibû nav Leylanê. Lê bavê wî ew şiyar kir:

- Ya Xwedê, serxweşê me nêzîk bû.

Hema çermê bavê wî lê hate hev û li ser piyan beziya. Şêxo tenê ma, ji bîr kir ji bavê xwe bixwaze ku êdî wî di xew de, nema bixwe. Hemdînê serxweş nêzîk bû:

- Merheba Şêxo, tu çawayî lo? Te Zeyno nas dikir?.. Zeynebê... ihî... ihî... ihî...

Giriya.

Zeynebê berî çend salan bi nav û deng bû. Hem bi xweşikbûna xwe, hem jî bi hildana her du lingên xwe. Zeyno jinek ji agir û berfê bû. Xwediya gewdeyekî spî û lihevhatî û wîneke germ. Dilbijokî ji çavê wê diherikî. Lêvên wê bang li mirov dikirin. Her du çiçikên girover di bin gomlekê rengînî de birûsk vedidan, agir ji wan diçû. Xortê ku lê dinêrî, kef bi ser devê wî diket. Ev xortên ku ji pêvî dê û xwişkên xwe ti jin nedîtine. Zeyno dilê gelekan dizî bû. Her êvar rûpelek bi navê wan dadigirt û her roj zencîra navan dirêjtir dibû. Bavê wê miribû. Birayê wê, piştî pola nehan, ew ji dibistanê derxistibû. Destpêkê newêrîbû xwe bida dest ti kesî. Evîndarên xwe tev de girêdayî dihiştin, lê di heman demê de, ew dûr jî dihiştin. Di dawiyê de, xwîngermiyê zora wê bir û kete nav ramanin qedexe. Mîratên şevên Amûdê dirêj in û rojên wê hîn dirêjtir in. Tiştekî agirî di nav ling û memik û lêv û por û pişta wê de, ew dişewitand. Kezeb lê zuha dikir.

-Ji pêvî Smaîlo kes tuneye.

Smaîlo dîne û nizane ji kesî re bêje. Ew çi bibêje, kes jê bawer nake. Mal tev de, ji bo xwarinê, li ber vekirine. Rojekê Îsmaîlo, birçî, hat. Zeyno tenê li mal bû. Ew têr xwarin kir:

- Zeyno ka çayê?

- Smaîlo were vê odê, çayê vexwe.

Zeyno li cem Smaîlo rûnişt. Bi destê xwe qedeha çayê da wî. Wî jî bi henekî, dev li destê wê kir. Zeyno ew li erdê dirêj kir. Destê xwe daxist berjêr. Derpiyê wî daxist û tiştekî qalind û dirêj di nav destê Zeynebê yê germ û agirî de, kef da. Zeyno ew mijand, ew alast, dihat ku wî bixwe. Her du çiçikên xwe lê pêçan û di nav ahînê de cilên xwe tev de belawela kirin. Li ser Smaîlo rûnişt, ew jî ditirsiya ku canê wê di devê wê re derkeve. Bi hildan û daxistinê re, Smaîlo ji şewata xweşiyê bi her du destan bi porê xwe digirt û dikişand. Rûyê Zeyno jî di nav biskên belavbûyî de winda bûbû. Her du lempeyên tijî şîr, di nav destên wî de, şikestin. Govenda dînbûn û xweşiyê bû. Heta qîjîniya cewrikekî birîndar ji Smaîlo derket. Zeyneba tazî, bi ser piştê de, li erdê rast bû. Smaîlo dikeniya, Zeyneb digiriya û xwîn ji ser her du rahnên wî paqij dikir. Smaîlo derpî kişand xwe. Bû çerpeçerpa devê wî.

- Eeeeeh.. Çi xweş bû.

Derket. Dîsa mewalê xwe berdewam kir. “Ez birçîîîî me.” Zeyno çend rojan xuya nekir. Piştre, her ji sê rojan, di hemêza mêrekî de, agir ji xwe dadiweşand. Li gelek xortan xweşî û agir û merezî û xweşikbûn û şahî belav dikir. Di ber re jî çendên din di nav arê evîna xwe de disotin. Yek ji wan Hemdînê bextreş bû. Ji dil û can xwe dabû evîna Zeyno. Wê jî carekê tenê hişt ku di derya ya xweşiya wê de avjeniyê bike. Zeyno nema di ber pêlên ava mêran re gihişt, avis bû. Nû bira pê hisiyabû, du rê li pêşiya wê vebûn:

- Kuştin, an zewaca bi bavê vî lawikê ku hîn di zikê wê de ye.

Zeyno Hemdîno kir bav jê re. Ji ber ku ti kes jê pepûktir nedît. Wî jî çav û guhên xwe ji zimanê xelkê girtin û ew xwest û ew “revand” bajarekî din. Lê her ku Hemdîno ji kar vedigeriya, ev pirs jê dikir:

- Zeyneb, kî li vir bû?

-Ezê bi şev ji te re bêjim.

Bi şev Hemdîno, di nav pêlên lêv û bisk û memik û goştekî ji berfê spîtir de, hiş winda dikir. Pêlin ji gulan bibêhntir û ji agir jî germtir bûn. Xwe winda dikir. Xwe û kalik kalikên xwe dida ber bahoza xweşiya Zeyno:

- Hevalekî birayê min bû lo Hemdînoo, ay, ay, ay.

Bi ahîna wê re Hemdîno dibû ba. Dibû tayekî zirav ji tunebûnê. Hetanî ku nav û dengê Zeyno, birayê wê, wekî mar, ji qulê derxe:

- Hemdîno ez gotineke din li ser jina te bibihîzim, tu wê nekujî, ez ê te û wê her duyan bikujim. Hemdîno çend rojan Zeyno xistibû bin çavan. Zeyno mal kiribû doşeka rêwiyan. Hêrsekê bi nava wî girtibû. Di wan kêlîkan de, hêrsa wî, mîna mayîneke nedîtî, teqiya. Jina wî, tazî di nav cihê wî de, bi yekî din re bû. Ji ber ku demança wî tunebû, beziya kêrê. Mêrik reviya. Gava kêr li Zeyno bilind kir, du tîrêjên ji agir ji çavên wê yên xweşik berfa hinavên Hemdîno, bi carekê, qelaştin. Destê wî lerizî. Kêr li erdê ket. Giriyekî reş Hemdîno zeft kiribû. Ne karîbû wê bikuje, ne jî karîbû bê wê bijî. Gotinên xelkê li ser şan û namûsê û... tev de di nîvê şevê de di nav agirê goştê Zeynebê yê spî de dibû dûman û arî. Rojekê ji kar vegeriya, jina kuştî li ser text dît. Birayê wê ev hevok jê re nivîsîbû:

“Hemdîno, Ji ber ku tu ne mêrî, min bi destê xwe, navê malbata xwe ji vê şermê paqij kir.”

Ji wê rojê ve Hemdîno serxweşe. Ti kesî ji xelkê neda dû laşê Zeynebê, wî bixwe ew veşart. Her şev dihat li ser gora wê, çixareyek ji “giyakê bihuştê”, heşîş, wilo nav lêkiriye, vedixwar û du sê şûşe dişkenandin û di ber hemû cîhanê de, digiriya:

- Ez di ber evîndarên dinyayê de digirîm. Eger ez mirim, min li kêleka Zeyno veşêrin. Ez Memoyê sedsala bîstan im.

Şêxo bi destê Hemdîno girt, ew gihand cem gora Zeyno û vegeriya mal. Serê Smaîlo xuya kir. Hemdîno qîr kirê:

- Smaîlo we re qedehekê vexwe, were.

Smaîlo lê vegerand:

- Kurro hûn vedixwin ji bo hûn bibin wek min. Ma ez vexwim ez ê bibim wek kê?

Li malê nalenala diya Şêxo bû:

- Pişta min çû lawo, pişta min.

Diya wî bûbû mîna zarokeke biçûk. Pûrtê laşê wê veşartîbû. Şêxo derket devê derî û xwest ku çareyekê bibîne. Bû pirtepirta baskên diya wî û firiya. Qirak di ber serê wî re firiya û bi ezmanan ket. Şêxo behetî mabû, wisa jî diya wî, mîna mêşeke reş li ezmanekî fireh û sayî, xuyanî dikir.

Bavê wî bû lawir. Diya wî bû qirak. Gelo wê ew bibe çi?

Kete nav ava ramanin kûr. Zîqezîq ji diranê wî hat û dest bi cûtina gomlekê xwe kir. Jiyana xwe dicût, temenê xwe dicût. Cîhan tev de, di nav diranên wî de, bû paçikekî cûtî. Li kolanan zarok lê diciviyan û li çepikan dixistin:

- Dîno dîno kirasê xwe diqetîno.

Xelkê nizanîbû çi bi diya wî hatiye. Hinekan digot:

-Ji mal reviyaye.

- Bi çolan ketiye.

- Da dû bav, dê li ser kir.

Şêxo, geh li Şermola bû ji xwe re pêkenok li ser zindiyan digotin û dikeniyan, geh jî bi dînan re dema xwe derbas dikir. Şêxo dînên mirî û yên sax hemû li hev civandin. Dînan, bi zimanê xwe yê taybet, li hev du dipirsî. Li ser hev dixeyidîn heta û hevdu diparastin. Hîndero biryara sazkirina komarekê da. Bi hilkişandina wî ya ser girê Şermola re, biryara avakirina komarê hate eşkerekirin. Pê re jî dengê kevir û dar û zarokan li erd û ezman belav bû:

- Dîno dîno kirasê xwe diqetîno.

## Komara Dînan

*Endamên komarê:*

1- Hîndero
2- Smaîlo
3- Şêxo
4- Xalibo
5- Newafo
6- Xelefo
7- Hecî Hemo
8- Şêrbello
9- Ehmed
10-Xanimê
11-Selaho
12-Izzo

*Artêşa komarê:*

Mamûn + Mencolê + Bavê Babil + Azado

Gava ku Hîndero û Smaîlo li hevdu rûniştibûn, ro diçû ava:

- Lawo Smaîlo, me di saxiya xwe de li hev nedikir. De, ka em di mirina xwe de bibin dost.

Smaîlo bikêf lê vegerand:

- Em çi qas bêhiş bûn lo, tê bîra te?

Dîn tev de li razîkirina Hîndero digeriyan, ji ber ku bersivên pirsên tevan li cem wî hebûn. Zanîbûn ku xwendina zêde û siya-

set bi dû dînbûna wî de bûn. Gora wî, heta wê gavê, mişt pirtûk û kovar û rojname bûn. Di civînên dînan de, tim ji Şêxo re digot:

- Lawo Şêxo, eger pişta me heba, ma niha rewşa me wilo ba? Ma nayê bîra te kalik û bavê te bi êşa piştê çûn. Dînino, delalno, kalik û bavên me, wek me û niha, bêpişt bûn. Lê ji niha û pê ve, divê em bi kêrî xwe bên.

Biken li Smaîlo zîvirî:

- Tu zanî zindî bi te dikenin.

- Çii.. bi Xwedê ez ji wan çêtir bûm, çi dibêjin?

- Dibêjin havînekê baran pir hat û nema sekinî. Smaîlo jî digot ku ev baran di destê yekî bi aqil de ba, wê têra me û deh salan bikira.

- Yabo ma ne xebera mine?

- Smaîlo.. tu hîn li ser a xwe yî?

- Na, ez li tiştina poşman bûme. Wek xeyda mina ji Amûdê. (Demekê Hîndero û Smaîlo bajarê Amûdê li hevdu parkirin. Ji çem û ber bi rojava ve perçe yê Hîndero bû. Ji çem û ber bi rojhilat ve perçe yê Smaîlo bû. Rojekê Hîndero bi şaşî derbas bû aliyê rojhilat. Hema Smaîlo yek nekir dido, rahişt kêrekê û li nav milên Hîndero xist. Xelk bi wan ve hatin. Hîndero derman kirin û ew li hev anîn. Lê, divê Smaîlo pêncî diravî bide wî. Smaîlo bi alîkariya Sofî Mihemedê Eyşanê “Yê ku her în çakêtê xwe li mizgefta mezin radixe û peran ji yên hejar re, dide hev. Vê carê pere ji Smaîlo re kom dikir:

- Lawo bila xêra we be, xwînek ketiye stûyê min.

Piştî pêncî diravê ku Hîndero dayê, rahişt tûrikê xwe û pişta xwe da Amûdê:

- Bi Xwedê, du dîn di bajarekî de nabin.

Her du dikeniyan:

- Maf bi xelkê re hebû bi me dikeniyan. Smaîlo guhê xwe bide min. “22” çilleyê paşîn nêzîk dibe. Divê em tiştekî girîng li Şermola bikin. Tiştekî wisa ku me, di jiyana xwe de, nikarîbû bikin.

Tevgereke fireh di nav dînan de peyda bû. Miriyan nizanîbûn bê çi bûye. Hîndero ew dicivandin. Bi roj û şev ew û Smaîlo dipeyivîn û dikirin pistepist. Carinan deng bilind dibû, lê ka yê ku zanibe bê dîn çi dixwazin. Şêxo çar lempe anîn û di girê Şermola de veşartin. Hîndero û Smaîlo û Newafo mezel kiribûn kewara mêşan. Şeva "21"ê çilleyê paşîn, Hîndero bang li Şêxo kir:

- Kanî çirayên ku min ew ji te xwestin?

- Serokê min, min lempe anîn.

Bi lez û bez, her çar lempe dane dest.

- Kanî kevirekî mezin?

Kevir jê re anîn.

- Yek.

Lempe şikand.

- Dido.. Sisê.. Çar.

Her çar lempe kirin ard.

- Şêxo! Lempe lempe ye û çira çira ye. Sibe divê çar çira di nav destên min de bin.

Dîn, her yek bi aliyekî ve terqiya.

Roja din çar çira li kêleka Şermola şewq didan. Hîndero, mirî tev de civandin. Li hêviya fermanên wî bûn. Hilkişiya ser gir. Selaho, nivîskarê wî, da dû. Destên wî mişt pel û rojname bûn. Hîndero, bi dengekî qube û bi seriyekî bilind, dest pê kir.

Miriyên hêja,

Hevalên delal,

Îro bîst û duduyê çilleyê paşîne. Divê careke din, di dîrokê de, ev roj bibe destpêka rojeke nû. Vê care, divê gava me sererast be û heta hetayê berdewam bike û şikestinê nebîne. Ez niha li vê meydanê û li ber çar çiran, avakirina komara dînan eşkere dikim.

Çepik bilind bûn. Miriyên ku di goran de mabûn bi qêrînê veciniqîn.

Bijî komara dînan!

Bijî azadî!

Miriyan, hestiyên xwe ber bi rûyê ezmanekî çavpêl û zuha ve bilind dikirin. Qêrîn dibû piçik û parî. Deng ji hinek miriyan hat:

- Divê ev komar ya miriyan tev da be.

Hîndero di cih de bersiv da:

- Deriyên vê komarê ji miriyên hêjayî tenê re, vekirîne. Ne her yek ji ramanên me razî ye. Eger mirov ne dîn be yan bi kêmanî hinek dînbûn pê re nebe, nikare têkeve bin sîka komara me.

- Bijî komara dînan!

- Em ê niha navên wezîr û berpirsiyarên komarê xuya bikin. Kerem bike hevalê Hawar! (Newafo)

Newafo bi cilên xwe yên leşkerî û bi stêrk û nîşanên xwe li ser girê Şermola sekinî. Navên wezîran hejmartin.

1- Hîndero - Serokkomar

2- Smaîlo - Wezîrê Xwarinê

3- Şêxo - Wezîrê Şer û Pevçûnê

4- Xalibo - Wezîrê Dadmendiyê

5- Newafo - Serokê Artêşê û Hêzên Şer

6- Xelefo - Wezîrê Aboriyê

7- Hecî Hemo - Wezîrê Oldariyê

8- Şêrbello - Wezîrê Rev û Koçkirinê

9- Beşîro - Wezîrê Çixare û Keçikên Dibistanê

10- Xanimê - Wezîra Karê Jinan

11- Selaho - Nivîskarê Serok û Wezîrê Çap û Weşanê

12- Izzo - Wezîrê Avahiyê (Avakirina Gor û Malan) Newafo ji wê rojê ve bû Hawar. Sipasiyên xwe li mirî û haziran belav kirin. Zîvirî, silaveke leşkerî li Hîndero re kir. Daket, Hîndero berdewam kir:

- Erê mirîno, hevalno!

Damezrandina komara me, divê ji hemû dîn û miriyên dinyayê re, bibe nimûne. Karê xwe xurttir bikin. Komarê bi hezkirin

û hevaltiyê bixemilînin, ji ber ku ev komar ne weke yên zindiyane. Ev komar ne ya mirovên sax û mirî tenê ye. Ya giya û gul û dar û kimorî û teyr û lawirane jî. Komareke gerdûnî ye. Wekî çavên xwe, lê miqatebin. Hûn tev de dizanin ku ji hezar salan ve em bêpişt in. Ez ji Xwedayê mezin hêvî dikim ku ji me re bibe pişt. Yê ku Xweda li pişta wî be, ketina wî nîn e.

Bijî dînbûn, bijî komara me!

Dînan, heta ew gihandin gora wî, Hîndero li ser destên xwe kirin.

Govend û dawetên miriyan heft roj û heft şevan berdewam kirin. Piştî wê, her yek vegeriya karê xwe. Jiyana wan a nû bi wan xweştir dihat. Lê her roj zindiyan çarçira didizîn. Newafo ferman gihand artêşê; herçî ku çirayên me bidize divê bimre. Bi dehan zarok û parsek û mêr hatin kuştin. Serok ferman da Şêxo, Wezîrê Şer û Pevçûnê, da ku çarçirayan bîne, lê divê mirî tenê wan bibînin. Ji ber vê, divê mirî bixwe wan çirayan çêbikin. Ji ber ku mirî gelek destgirtî û dilreş bûn, şer û pevçûn derdiketin. Şêxo rê li ber dizên zindî girt. Zindiyan, ji pêvî axa Şermola, nema karîbûn tiştek bidiziyana. Nîvê şevê dihatin axa reş didizîn û direviyan. Heta ferman gihişt kimorî û dûpişkan, da ku axa Şermola biparêzin. Kî dihat diziyê, mar yan dûpişk pê vedida. Li nav xelkên zindî ev bawerî belav bû; “Axa Şermola tijî mar û dûpişk in.” Nema wêrîbûn ax bidiziyana.

Zindî wisane... tirsonek in.

Hîndero ferman li dû fermanê belav dikir. Selaho çapxane zêde dikirin. Nema kesek ji kesekî din re vala bû.

“Divê her tişt li nav me eşkere bibe. Ya giring ewe ku tiştek bidizî û veşartî nemîne. Ez bi hêvî me, hûn me nekin wek dewletên zindiyan ku em xelkê tev de bikin guh û guhan biçînin. Di her malê de ev rewşa hebû. Her yek yê din ji bo diravekî bikuje û bira bira bifiroşe. Ev rewşa zindiyane, ne ya me ye. Ji ber vê jî divê dîn ji hemû miriyan re bibin nimûne. Bawer bikin ku Xwedê pirr ji me

hez dike, ji ber vê em dîn kirine. Dînbûn hezkirineke xwedayî ye. Bi dest herkesî nakeve. Bi sedan, li dora we zindiyan rewşenbîr û zane hene ku dixwazin dîn bibin, lê bi destê wan nakeve. Xwedê êş daye wan û jîrbûn daye me. Li gor vî barîbin û komara xwe ji nezan û zindiyên çavsor û miriyên zikreş biparêzin.

**SELAHO**

Selaho, her sibe, bi kolanan diket û her êvar vedigeriya Şermola, ji bo daxuyaniyên din biweşîne. Bi sedan rojname difirotin. Destpêkê mirî û zindiyan dixwendin. Lê roj bi roj xwendevan kêm dibûn. Nemaze di nav zindiyan de. Pirtûk û rojname û kovar, nema dihatin xwendin. Xelk bixwe daketibûn. Henekê xwe bi xwendevanên rojname û kovaran dikirin. Zindiyan nema diravek tenê didan bi rojname û pirtûkên cîhanê tev de. Piçika hişê Selaho yê mayî jî firiya. Berê her ku wê deriyê serşokê li xwe bigirta, birayê wî yê mezin derî lê vedikir. Li laşê wî yê tazî dinêrî:

- Te sabûn û av bi me ve nehişt.

Selaho tazî derdiket kolanan. Dibeziya û bang dikir:

- Birayê min berra min da.

Tazî li kolanan dikir sema!

- Birayê min berra min da.

Piçûkanî bavê wî jê dixwest bixwîne. Pirtûkên xwe kom dikirin. Datanîn ser serê xwe û ji bavê xwe re digot:

- Ka çawa evqas pirtûk wê têkevin vî serê biçûçik?.

Niha Selaho wezîre. Wezîrekî ji pelên rojnama ye. Dema radiweste, rojnameyên xwe ji xwe re dike balîf û dikeve xewê. Carinan doşekê bi pirtûk û kovaran çêdike. Xwe li ser dirêj dike. Yan jî wan dike xwarina agir. Rojname di bêrîkên wî de bûn, di paşila wî de bûn, di bin çengê wî de bûn. Nûçeyên balkêş tenê dixwîne:

* Îro... yekî dergîsiya xwe ji qata şeşan avêt û xwe jî bi ser de kuşt.

* Îro.. fermanin nû. Rewşa komarê. Bîranînên miriyan.

* Îro.. zindiyan laşên çar miriyan dizîn û pênc gor vekirî hatin dîtin.

* Îro.. dinya, mirî, xelk, zindî, kuştin, ken, girtin, kirîn, firotin, ceng, wê qiyamet rabe, qiyamet. Werin rojnameyên îro bixwînin.

Carinan jî wezîrê weşanê birçî dibû, ji ber ku ti kesî li welatê wî nedixwend, li ber rojnameyên xwe rûdinişt û yeko yeko ew dixwarin.

**HECÎ HEMO**

Jêhatî bû, lê wirr bû, çav çewt bû. Di xortaniya xwe de, berî dest bi firotina goşt bike, karê wî zewac bû. Pênc, şeş jin anîn. Her wê biba xwedî jin, bi dû heft rojan de, dema xwediyên jinê dihatin cem, ji bavê jina xwe re digot:

- Qîza xwe jî bi xwe re bibe û venegere.

Bav vediciniqî û têdigihişt ku qîza wî ne qîz derketiye. Divê bê kuştin, an jî divê ev şerma reş nekeve devê xelkê. Hemo jî gotinên xwe jiber kiribûn:

-Ji ber ku hûn meriv in, em ê jî vê şermê veşêrin.

Carek, dido, çar û pênc, nema kesî qîza xwe didayê. Heta çû jinek ji Nisêbînê xwest. Piştî zewacê bi heft rojan, bavê wê jî hat. Di wê demê de, her çendî dereng bû jî her tişt li ser Hemo bihîstibûn. Ji ber vê, dema Hemo dest bi gotina xwe kir:

-Ji ber ku hûn meriv in, em ê vê şermê veşê...

Heft fîşekan xwîn bi ser dest û lingê wî de herikandin û bû hewar hewara wî. Ti kesî nizanîbû ku ev fîşek dermanê wî bûn û berê wî dan hecê. Xelkê çîrokên wî ji bîr kiribûn. Rojekê xwişka xwe, di nav leman de, bi yekî re dît. Bi dû de beziya. Ket, westiya û tişt bisernexist. Xelkê digot:

- Mêrik ber bi bakur ve direviya, Hemo jî ber bi rohilat ve ketibû pey wî. Dema tişt ji leman fêde nekir, vegeriya û dest bi xwarina leman kir. Piştî wê, xwişka xwe tazî bi yekî re, di malê

de, girt. Lawik cilê xwe hiştin û beziya. Mîna kuliyekî xwe avêt derve. Yekser ew nas kir. Hema rahişt cilên wî û çû cem bavê wî:

- Yan tê bê keçika me niha bixwazî, yan em ê hev du bikujin.

Xwişka wî zewicî. Hemoyê çavçewt gazinek tenê ji zava kir:

- Lawo tu bi dizî hatibûyî cem xwişka min, xem nake, lê te çima hevalê xwe bi xwe re anîbû.

Zavê lê vegerand:

-Jixwe bipirse bê çima çavê te sisê ne.

Hemoyê bi sêçavan, bû Hecî Hemo. Ji dil û can dest bi karê xwe kir. Hemo çi qasî bi firotina goşt û çandiniyê zengîn bû, ewqas bira û bavê wî jî di bin deynan de mabûn. Ji ber ku Hemo pere tev de di ber birayên xwe û bavê xwe de dan, wan jî bi qumarê hemû tar û mar kirin. Ev gotin li nav xelkê belav bû:

- Hecî Hemo dîne.. dîne.

Salekê mûsim nehat. Baran tune bû. Xelk dihalin ku hevdu bixwin. Rewşa Hecî Hemo xerab bû. Bira û bav bi hev re jê direviyan. Pereyên ku mabûn jî tev de kirin mengena goşt û vî hesinê bêcan ew pere cûtin. Kirin piçik û parî. Ji wê rojê ve Hecî Hemo dînbûna xwe eşkere kir. Derket kolanan. Di nîvê rê de rûnişt û ji nişkê ve bang kir:

- Ya reb, ya reb tu me biparêzî. Bav li law siwar tê. Bira li bav siwar tê. Govenda pera ye. Bira li bira siwar tê. Siwarên yabo siwarên, tev de li hev siwar bin. Dinya bûye siwarbûn û ya reb.. ya qeyûm.

Bi dengekî zelal û xemgîn dest bi stirana xwe kir.

*Lo lo siwaro*
*Rêka min dûr e*
*Ez bê heval im*
*Derdê min kûr e*
*Hesret giran e*
*Derdê dilan e*

*Bêkeso dilo*
*Tim êş û jan e*
*Lo lo siwaro*
*Ji min nepirse*
*Dilê min î jar*
*Gelek bi tirs e*
*Ditirsim bimirim*
*Ez bi hesretê*
*Dinyayê nema*
*Sebram li te tê*

Baranê dest pê kir. Mirî bi dengê Hecî Hemo re serxweş dibûn. Gotinên wî di civatan de gelekî kêm bûn. Lê gava dipeyivî gotinin ku êş ji wan diweşiya digotin.

- Erê birano. Erê ez di nav we de me, bi we re dikenim, bi we re digirîm, lê ez bi tenê me, tenê me. Ne li dinyayekê tenê belê li her du dinyayan.

Dîsa dest bi ahîna xwe ya bişewat kir:

Ax, heta ez hebim ax
Xwedêyo ez ê çi bikim
Ji van birînên kambax

Bi dû vê stiranê re, serê xwe danî ser kêla gorekê û giriya. Heta nema deng jê hat. Mizgeftên biçûçik bi axa Şermola ava dikirin. Dûv re xera dikirin.

Heriya mizgeftê dikir gilok û dixwar. Herî dixwar, dilê wî dihat ku di devê wî re derkeve. Niha bû wezîrê oldariyê. Mizgeftek mezin ava kir û kursiyek danî ber derî. Li ser rûnişt û rahişt tivingê:

- Ev mala Xwedê ye. Çênabe ti kes derbas be hundir.

- Em ê nimêj kin.

- Herin mizgeftin din. Herin mal!

Tenê diket hundirê mizgeftê. Ji xwe re distira û ji pêvî Xwedayê mezin, nema êşên xwe li ber ti kesî radixistin:

Xwedêyo bitenê me

Xwedêyo çav li rê me

Nizanim li hêviya kê me

Tenê zanim ez tenê me

Digiriya, her ku dest bi stiranan dikir, ezman jî dest bi hêsiran dikir û baran dibariya. Izzo jê re malek ji tenekeyan çêkir. Karê wî mabû komkirina teneke û textikan. Tim teneke di destê wî de bû.

Her ku mêrek yan jinek didît û nediket serê wî, nêzîkayî lê dikir û teneke di serî de dipelixand û direviya. Mirî û zindî tev de ji tenekeyên Izzo ditirsiyan.

**IZZO**

Kurdunde bû. Jina wî miribû. Bêkes bû, tu kesî nizanibû bê ji ku hatiye, yan ji kîjan êlê ye. Destekî wî jêkirî bû. Gelekî bihêz bû. Tev de jê ditirsiyan. Riha xwe her ji mehekê carekê kurr dikir. Porgijik bû. Girrê xwe di her kesî dida:

- Xwedê kir ku tu bi destekî tenê yî.

Gava mêrek zeft dikir, bi destê saxlem bi qepera wî digirt û bi destê jêkirî ew wek mîxekî di erdê de dikuta. Bi kulman li serê wî dixist, heta ew direviya yan rûdinişt. Tenekeyên vala li kolanan nehiştin. Tev de dan hev û xaniyek ji tenekeyan li hewşa dibistanê ava kir. Ne berpirsiyar, ne jî mamosteyan, ti kesî newêrîbû nêzîkayî li mala wî bike. Eger derî li xwe bigirta, ti hêzê nikarîbû wî derî lê veke. Xaniyê wî bûbû cihê matmayînê. Çawa teneke ewqasî xwe bihev digrin? Xelkê bersiv da:

- Tenekeyên mişt zêr li ba wî hene.

Mîna agirekî ku bahoz wî li qirşikan belav bike, ev xeber belav bû. Izzo di zivistanê de li hundirê xwe radiket. Havînan, ji ber ku hundir germ bû, li salona dibistanê radiket. Tevî ku ti pencere tê de tunebûn.

Bi dehên caran diz dihatin ku deriyê wî bişkînin, da tenekeyên zêr bibin, lê derî, carekê tenê jî venebû. Rojekê serê sibê, li ber devê deriyê wî, xelkê Izzo kuştî dît. Hinek mû di nav tiliyên wî de bûn. Xuya bû gelekî li ber xwe dabû. Berî bi kêran bê kuştin, agir berdabûn mala wî, lê tiştek neşewitîbû. Newafo berî her kesî pê ve hat. Newafo yê hergav, ji ber tirsa Izzo derpiyê wî şil bû, berî her kesî bi hewara wî ve hatibû. Gotinên xwe yên her gav dubare dikirin:

- Dîno dîno derpî şîno.

Her carê Izzo lêxistineke germ û nerm li Newafo dikir. Heta derpî şil dikir. Xelk li laşê wî civiyan, lê ti kesî mûyên di nav tiliyên Izzo de nas nekir:

- Reşikê şevê ew kuştiye.

Dema Şêxo bihîst perçe ji xwe kirin:

- Ev mû ne mûyên reşikê şevê ne. Ev mû mûyên seriyên mirovin zindî ne:

Bêhna zêr hişt ku ji nişkê ve, hinek li Izzoyê mirî xwedî derkevin. Wê çaxê hikumetê dest danîbû ser tenekeyên zêr. Xwediyên Izzo poşman bibûn ku xwe eşkere kirin. Lê niha serên xwe pê bilind dikin. Tê mal û gorên wan ji wan re ava dike. Gelek gorên ji teneke û textan çêkirin. Bi reşikê şevê re bibû dost. Her duyan mirovên bizdok ditirsandin. Carinan Izzo tenê diçe wan:

- Te çi kir jê?

- Min ew ziravqetandî kir. Min ew qutifand. Min nizanîbû ku zindî wilo ji miriyan ditirsin.

## HÎNDERO

Hîn biçûçik bû, pirtûkên dîrokî û siyasî dixwendin. Bû endamê partiyeke mezin. Ji dil û can kar dikir. ji nişkê ve partiya wî bû du partî. Nema zanîbû bê têkeve rêza kîjan aliyî. Demekê wilo ma. Dûv re tevlî partiyê bû. Dîsa perçe bû. Bi şev û roj digotin; “Yekîtî...

yekîtî” û bi şev û roj perçe zêdetir dibûn. Nema karîbû navên wan bijmêre. Vê dawiyê têgihîşt ku ew bixwe partiyeke serbixwe ye. Demekê windayî ma, piştre wî bixwe jî dest bi perçebûnê kir. Her perçeyek ji laşê wî bû partiyek. Qerebalix û xirecir kete laş û canê wî. Nema tiştek ji hevdu derdixist. Destê çepê radibû yê rastê. Her tiliyekê seriyek dikişand. Laşê wî bû kewara raman û mêşan. Di vê xeleka vala de Hîndero hiş winda kir.

Berê li serxwebûnê digeriya, niha li hişê xwe digere. Li xwe digere. Tim digot; min ev komar ava kir, ji bo em xwe bibînin. Nû têgihiştin, digotin erê. Lê, ti kesî nizanîbû Hîndero çê dibêje.

**XALIBO**

Xalibo radihişt çi tiştî, dizanîbû ku ew tişt çend kîlo ye, yan çend giram e. Ji ber vê ti carî bêkar nedima. Xalibo mêzên bû. Li cem xwediyê, goşt, mêwe, dendik û sêvan kar dikir. Li şûna mêzênê radiwestiya. Kê çend kîlo bixwestana, dida wan. Destê wî mêzên bû. Li cem ti kesî berdewam nedikir. Ji ber ku her ji saetekê, ji nişkê ve, winda dibû:

- Tu li ku bûyî?

- Ez çûm cihekî û ez hatim.

- Careke din wilo neke ha!

- Erê… erê!

Carekê goştfiroş da dû. Dît ku li qorzîkekê Xalibo destê xwe dirêjî “tiştê” xwe kiriye û ahîn pêketiye. Goştfiroş deng nekir. Lê dema dît ku Xalibo ev kirin ji xwe re kiriye kar û ti qorzîk ji bazarê zuha bernedaye, çû ji diya wî re got:

-Jinekê ji lawê xwe re bîn, çêtir e. Bi Xwedê, lehî li wan qorzîkan rakiriye. Diya wî jinek nîvdîn jê re anî. Tev ku Xalibo di çûn û hatinê de digot:“Min navê.”, lê dîsa jî diya jin jê re anî:

- Lawo em ê jinê ji te re bînin, belkî tu aqilekî ji xwe re bigrî.

Di şeva zewaca xwe de terqiya. Bi çolan ket. Piştî çend rojan ew nîv sax nîv mirî, di qorzîkeke reş de, dîtin. Li malê karê wî mabû dagirtina avê.

Firax tev de dadigirtin. Diya wî dikir ku biteqe. Berê xwe ber bi jor ve dikir:

- Xwedê bavê te ji Şermola vegerîne.

Piştî ku bû wezîrê dadmendiyê dest ji firaxan berda, karê wî mabû çêkirina mêzênan. Mêzên bê pere li xelkê belav dikirin. Her carê bang Selaho dikir:

- Kanî ez pirtûkên te li mêzênê kim.

Aliyekî mêzênê tijî pirtûk û kovar û rojname dikirin û aliyê din vala dihişt.

- Selaho... kanî sola xwe bide min.

Sola Selaho ya kevin û şimikek, ji pirtûk û rojnameyên wî girantir bûn. Selaho matmayî li Xalibo dinêrî:

- Çawa evqas pirtûkên giran ji sola min siviktir in.

Xalibo bihêrs devê wî digirt:

- Hiş kurro.. ev îşê Xwedê ye.

Bavê min tim digot; ji hezarê salan ve ye ku sol ji pirtûkan girantir in. Ez mêzên im û ez dizanim.

**AZADO**

Şêwekar bû. Hunermendekî destsivik û jîr bû. Ji gava ku bîr biriye, cîhana wî, şev û roja wî, reng û tablo bûn. Tiştek li dora wî nema ku bi rengên wêneyên wan di tabloyên xwe de saznekirine. Di şevên dirêj de, di nav rengan de, ceng û şerên giran birêvedibirin. Diya wî nema karîbû ev rewş bipejiranda:

- Lawo bi Xwedê tê dîn bibî ha.

Xwarina wî kêm bûbû. Hevalên wî jê dûr diketin. Wî jî xwe di dojeha rengan de dişewitand:

- Ez ê wêneyê Xwedê çêkim.

Di ber muzîka kilasîk re, firça wî ranediwestiya. Bach, Beethoven, Mozart û Chopen tev de pê re di odê de diliviyan:

- Divê ez Xwedê resim bikim.

Derdiket kolanan. Gava dimeşiya serê xwe nedihejand û ji bo li kesekî nenêre qet serê xwe nedizîvirand viyalî wiyalî. Silavê li kesekî nake. Dema ji tabloya xwe aciz dibû, rûyê xwe di nav rengan de dihişt û derdiket:

- Tu çi dikî Azad?

- Yadê, ez li Xwedê digerim.

Ji roja ku dînbûna wî eşkere bû, heta ku bû endamê artêşa komarê, ti kesî newêrîbû jê re bigota:

- Sîka te xwar e.

Heta vê gavê, Azado li ber tabloya xwe rawestiyaye û dibêje:

- Ez ê Xwedê bi rengan çêkim.

**ŞÊRBELLO**

Tim tûrikê reş li nav pişta wî bû û digeriya:

- Ez gundan difiroşim. Tûrikê min tije gund in. Werin gundên firotinê "Rengo-qezembûkê - Doda - Bilêqyê - Elîfero - Heremreş - Birîva - Heremê Şêxo - Olçya - Merkebê - Çetelê - Kerengo- Gundor - Tel Şe'îrê.. Werin gundan, gundên erzan, xweşik, malê belaş.

Xelk li dora wî diciviyan û henek pê dikirin:

- Tê Doda bi çi qasî bifroşî?

- Bi pênc diravan, Doda buha ye.

-Na..buhaye.

- Ka sê diravan.

Pere distendin. Devê tûrik vedikir û gundek jê derdixist. Dengê wî dîsa li kolanan belav dibû:

- Werin gundan "Sorka - Xezalîkê - Şorik - Girêxêlid - Senceqê - Cewherya- Babxêrê - Telxenzîr- Mozan- Nicim- Xirbexezal- Kevirêspî - Kêstek - Talikê - Çêlekê - Dîkê... werin gundan.

Yekî jê pirsî:

- Ma tu çima Amûdê nafroşî?

- Na, eger ez Amûdê bifroşim, ez ê bi ku ve herim? Ez Amûdê nikarim bifroşim.

Ajovanê kemyonê li dora xwe zîvirî, ji pêvî Şêrbello ti kes nedît:

-Ji kerema xwe re, ez ê paş de vegerim û ez rê nabînim. Tu bi destan ji min re bêjî wê baş bibe, ji bo ez tiştekî xerab nekim. Şêrbello bi kêf pê ve hat:

- Tê gundekî ji min bikirî?

- Erê.. erê.

Bi serê ziman got. Şêrbello jê bawer nekir.

Ajovan nema li pişt xwe dinerî. Kemyon li gor liva destê Şêrbello vegeriya:

- Vegere.. vegere.. vegere. Bes, te ker kuşt.

Ajovan daket, termê kerê perçiqî ji bin tekeran derxist. Şêrbello reviya û mîna bazirganekî jêhatî tûrikê xwe li ba kir. Gund di tûrik de neman, tev de rijandin erdê. Bû wezîrê koçkirinê. Pasaportên xelkê ji wan distendin:

- Ez ê di du rojan de "Vîza"yanî erêbûna derketinê ji we re bînim.

Tûrik mezintir kir. Nema bi firotina gundan razîbû.

- Werin dewletan; Elmanya, Swêsra, Frensa, Holanda, Rûsya, Siwêd.. werin dewletan bikirin.

Bira bira ye û bazar xuya ye. Welat bi perane, ev welatê we bêkêr e. Jiyan lê jehre.

Ti kes nemabû ku peyvên wî nas nedikirin:

- Kî dixwaze ji welatê jehrê here welatê hingiv? Welat bi pera ne, werin bikirin, tûrik mişt welat in, welat jî mişt tûrik in û werin bazara welatan.

Şêrbello, her sibe, bi tûrikekî mişt welat derdiket. Û bi tûrikekî mişt pere û xwarin vedigeriya Şermola.

## MENCOLÊ

Sala hezar û nehsed û şêst û yekê, porê wê bi agirê sînema Amûdê şewitî. Bi hewara lawê xwe yê bi tenê ve çû. Wê rojê bêhna

goştê biraştî yê sêsed zarokên şewitî hawîrdora Amûdê girtibû. Rahişt hestiyekî reş û vegeriya. Ji wê bûyerê ve Mencolê ji ser xwe çû. Ya ku dît, ti kes nebîne. Deh, deh zarok di nav êgir de digevizîn. Xelkê miriyên xwe li Şermola veşartin. Kêm mal ji bajêr bê mirî mabûn. Mencolê hestî xistin tabûteke biçûçik û di axa Şermola de veşart. Her ku lawikekî biçûk li kolanê didît, ew maç dikir:

- Here malê, lawo here. Berî ku agir bi te keve.

- Here lawo, niha diya te li hêviya te ye.

Piştî bîst sal derbas bûn, dîsa jî her ku xortek didît, digotê:

- Xorto, niha lawê min jî wê wekî te bûya. Xwedêyo te çi malik li me xera kir.

Mencolê bi xwe re dipeyivî. Xelk ji agirê wê ditirsiyan. Gelekî agir dadida. Carinan hêrs dibû û bi çolan diket:

- Ez ê Amûdê mal bi mal bişewitînim. Ez zarokekî lê sax nahêlim.

Zêdeyî carekê ew tev li tenekeya mazotê girtin. Teneka mazotê di dest de bû û bi ser dîwaran de dirijand:

- Çawa kezeba min şewitî, ez ê jî kezebên we bişewitînim.

Ew berdidan, kirasê xwe dida ber diranan û diçirand:

- Li welatekî wilo dilkevir, divê mirov xwe tazî bike. Divê bi lingê xwe bipeyive, yan jî her du lingan hilde. Kî Xwedî namûse bela bê. Bela bê lawê min vegerîne.

Piştî sîh salî agir bi hebsê ket. Mencolê, berî jinên girtiyan, li ser laşê şêst girtiyên şewitî rawestiya û qîriya:

- Duh sînema bû, îro hebs e. Xwedê zane sibe dora çi ye? Bişewitin, bişewitin, belkî hûn bêne şûştin, encex agir tenê karibe we paqij bike. Hîn agirê sînema nehatiye vemirandin. Ev sîh salên min in ku ez dişewitim. Hîn tola wan zarokan li erdê ye. Canên wan sax in, eger hûn bawer nakin jî bibînin.

Mencolê du tilî di devê xwe de tewandin û kir fîkînî. Sêsed leşkerên çekdar li ber wê rêzbûn. Bi yek dengî gotin:

- Em amade ne dayê.

Mencolê bi serê lêvan vegerand:

- Niha herin... Heta ez we bixwazim

Her sêsed leşker bûn stûnek ji ronahiyê û bi valahiya ezman ve hilkişiyan. Mencolê keserên kûr kişandin. Di firehkirina artêşê de diramiya. Ji Newafo re got:

- Em ê her malekê dînekî tê de çêkin.

Newafo keniya.

Mencolê leşkerên xwe yên ji ronahiyê civandin û ferman da wan:

- Mêrxasino, divê hûn têkevin vî welatî, gav bi gav, mal bi mal. D înbûn pêwistiyeke Xwedayî ye. Ji ber vê, divê her malek bi kêmanî dînekî wan hebe. Dawiyê... Mala bê dîn, divê bişewite.

Leşkerên Mencolê mîna sitêrkan ji hev belav bûn. Ji wê rojê ve, dîn û malên şewitî li welêt pirrtir dibin.

**MAMÛN**

Mamûn ji xerabiyê hez dikir. biçûkanî tiştekî xwe li ber nedigirt. Gava tiştek dişikand, wekî ku barekî giran ji ser pişta xwe bide alî, bêhna wî derdiket. Bawerî bi dê û bavê wî re çêbû ku Şeytan di laşê lawê wan de ye:

- Hecî, em ê wî bibin mala Şêxê mezin, dibe ku bê ser rê û baş bibe.

Ew ji mala Şêx vegerandin. Sê nivişt pê ve daleqandibûn. Lê ew nivişt a dinî rojê bibû pîşo. Bavê wî û cîranan ew girêdan û dest xistin qeydê. Heft rojan ava xwê pê dane vexwarin. Bi daran lêxistin, ji bo ku Şeytan ji laş û canê wî derkeve. Piştre, ew berdan. Sê rojan dê û bavê wî kêfxweş bûn, lê qet nizanibûn ku ev destpêka bahoza dînbûnê ye. Reviya, bi çolan ket. Bav jî bi dû ket. Dixwest ku vê care bi gopalê xwe şeytên ji gewdeyê lawê xwe derxîne. Lê, Mamûn ji tirimbêlekê dadiket, li yeke din siwar dihat, ji bajarekî diçû bajarekî û nedihat zeftkirin. Carekê posteya ku ew têdebû qulibî, bîst û sê kes hatin kuştin. Mamûn li ser laşên wan rawestiya û bi hevalê xwe yê mirî re keniya:

- Niha tu saxbûyî lawo, tu çi zû mir.

Keniya, heta hêsir ji tiliyên wî hatin. Vegeriya mal, Cîran tev de bi bîrê daketibûn. Bîr miçiqî bû. Mamûn ji dûr ve hat û xwe ser serî avêt hundirê bîrê. Cîran û xelk tev de veciniqîn:

- Mamûn xwe kuşt.

Piştî kêlîkekê bû tiqetiqa kenê Mamûn û bang li wan kir:

- Werin min derxînin. Ez di avê de fetisîm.

Werîs berdan binê bîrê û Mamûn sipîsax derxistin. Ji wê rojê ve, av tê ku bi ser devê bîrê keve.

**XELEFO**

Li leşkeriyê, bû navmaliyê serleşkerekî mezin. Karê mala wî tev de li ser pişta Xelefo bû:

- Xelefo kanî taştê.. Şîv.. Keçikê bibe gerê.

Jina wî pirr xweşik bû. Di rojên pêşî de Xelefo ji ber spehîbûn û paqijiya wê ji ber xwe fedî dikir, lê hêdî hêdî û bi demê re her dîwar di nav wan de hilweşiya. Carekê jinê jê xwest ku here odeya xewê. Xelefo bilez çû li hêviya xwesteka wê ma. Nêzîkî wî bû, ew ajot ber text û destê xwe yê nazik danî ser dêmên Xelefo. Bi paş ve vegeriya û li ser text rûnişt. Jin li cem rûnişt û destê xwe danî ser çoga wî. Bi nermayî tiliyên wê ber bi zikê wî ve bilind bûn:

- Xanim... çççç nabe!

- Xelefo.. tu zanî mêrê min ji min re vala nabe. Eger vala dibe jî dema xwe bi keçikan re diqedîne.

-Lêêê.. ez nikarim.

-Eger tu tiştekî nekî, ez ê ji mêrê xwe re bêjim ku te dest avêtiye min. Xwedê tenê zane wê çi bê serê te.

Xelefo di nav destên wê de bû gilokek ji agir. Xwe dît ku şilfî tazî di nav deryaya goştê spî de avjeniyê dike. Lê bextê reş mêr bi ser de şand. Tazî, di nav lepê serleşker de diperpitî. Çend salên dûdirêj di zindanê de qedandin. Digotin; ji lêxistinê mejiyê wî

çelq bûye. Bav û birayên wî bi hezaran dirav xistin devên vekirî, heta ku karîbûn cihê wî nas bikin. Bi sedhezaran pere rijandin, heta ku ew berdan. Xelefo derket:

- Heta ez sax bim, ez nikarim deynên xelkê li wan vegerînim.

Her şev xwe di bin çewalên mişt pere de, didît. Di xew de, her şev komên pereyan li erdê didîtin. Heta niha xwesteka wî ji Xwedê ew e ku carekê tenê, xewna wî bi cih bê.

**BEŞÎRO**

Kenê Beşîro bi nav û deng bû. Bi her tiştî dikeniya. Li şûna miriyan dikeniya bêhtir ku li dawetan bikene. Li jinan dinêrî û dikeniya. Li mêran dinêrî û dikeniya. Ken dê û bavê wî bû.

- Çima mirov li ser lingan dimeşe, ne li ser destan?

Xwe davête erdê û li ser destên xwe dimeşiya. Dikeniya:

- Çima du çavên mirov in, ne çar û pênc in? Çi xweş bû ku mirov di pozê xwe re avê vexwe, yan bi zimanê xwe li tembûrê xîne, ha ha ha.

Dengê tirênê bi kenê xwe yê dirêj û “teqlo meqlo” derdixist. Berê xwe da cem kalikê xwe. Li nav dewaran, kalikê wî gavan bû. Beşîro li golik siwar dihat. Garan dida dûv xwe û ew diçêrand. Her ku ga li çêlekê siwar bihata, Beşîro dilîland û dikeniya:

- Çima çêlek û ga ji hev hez dikin? Çima golik napeyivin? Beşîro bi ramanên xwe re dûr diçû. Garan li çolê dihişt, siwarê golik dihat bajêr:

- Dewar jî wekî me ne. Çima em goştê wan dixwin, ew goştê me naxwin?

Hate ber çavê wî ku mirov rûniştiye û çêlekê bi saxî dixwe:

- Ev xwarin neketiye serê min. Roj bi roj zêdeyî carekê jî gelo ne ji xwarinê ba wê dinya ne xweştir ba?

Hefsarê golik kişand û vegeriya cem kalikê xwe. Golik berda nav garanê û tenê ma. Ji xwe re dimeşiya û di halê mirovan û vê dinyayê de diramiya. Destê xwe dirêj dikir. Ji tiliyên xwe re digot:

- Bileqin... bileqin!

Tiliyên wî dileqiyan.

Ji lingê xwe re digot:

- Raweste, raweste!

Lingên wî radiwestiyan.

Dikeniya.

- Çi kenê min bi laşê mirovan tê. Du ling, du çav, du guh, du poz, du dev, du... ha ha ha. Çima mirov bi pozekî tenê ye ez nizanim?

Beşîro qelew bû. Cil bipîne bû. Tim zarokan kevir lê dibarandin û ew ditirsandin:

- Beşîro... golo hat te.

Direviya û dikeniya.

- Beşîro.. çêlê hat te.

Kenê xwe berdewam dikir. Leza xwe xurttir dikir. Bi vî awayî, ji garanê dûr ket. Berê xwe da sînor. Xwe di nav van ramanên xwe de ji bîr kiribû. Ji nişkê ve gurmînî ji wan derûdoran hat. Bombeyên sînor laşê wî kirin piçik û parî. Piştî mirinê jî Beşîro dikeniya. Şevekê, gora xwe vekir. Derket, li ser kêla gora xwe, bi xêzekê qalind, nivîsand û têra xwe keniya:

- Gelo çima mirov dimire?

## BAVÊ BABIL

Li polik û bermahiyan digeriya. Her ku kevirekî kevin yan resmekî kevirî didît, dixist bêrîka xwe û berê xwe dida cem kesên entîkenas ku baş bi razên bermahiyan dizanin. Her kesî digot; ku gencîne li derdora Şermola hene. Gencîneyên veşartî ne. Gava ji Bavê Babil dipirsîn bê ew li wan derûdoran li çi digere, yekser bersiv dida:

- Mirîşka me winda bûye, ez lê digerim.

Di zivistanê de, cilên havînê li xwe dikirin. Di havînê de, cilên zivistanê li xwe dikirin. Tim îsot yan bacaneke reş di berîka

çakêtê wî de bû, tam li ser dilê wî. Eger hêrs dibû îsot yan bacan di serê yê li kêleka xwe de lêdixist. Xelk jê ditirsiyan:

- Kanî diravekî, kanî weraqakê..

Kê zêde yan kêmî diravekî bida, wê îsotek yan bacanek, yan jî wê şiqamek bixwara:

- Keleheke hêjayî di bin vê erdê de ye. Ez ê wê bibînim.

Tîne ber çavên xwe ku keleh wê, di demeke nêzîk de, deriyên xwe jê re veke û Bavê Babil wê bibe şahînşahê dinyayê. Di dilê xwe de ji xelkê re digot:

- Erê, îro ji xwe re têr bi min bikenin, lê sibe em ê bibînin bê wê kî bi kê bikene.

**XANIMÊ**

Xanima porhirî, destqop, xwediya qewsikê dijwar. Zarok dihatin cem, ji bo qewsikan ji wan re çêke. Eger girr ji yekî bigre, dide dû, heta serê wî dişkîne. Lê ku serî neşike, diçe ber dîwêr û bihêz xwe serê xwe lê dixîne, heta ku radiweste û dikeve. Eger bi kêf be û kesek jêre bibêje:“Tu çawayî Xanimê” dibêje; kanî maçekê. Karê wê teqandina kîsên nayloniye.Bi devê xwe kîs tije ba dike û bi destê saxlem diteqîne. Xeberan ji jinan re dide:

- Ez ê serê Hecî Hemo bi we vekim.

Ji Şêxo hez dikir. Serê sê salane ku di ber guhên yên dora xwe re davêt:

- Herin Şêxo ji min re bixwazin. Ji bo tola min ji dijminan re nehêle.

Zarok digirtin. Tiştên wan, guhar, lîstik, pere, ji wan distendin. Çi diket ber destê wê, davêt bêrîkên xwe. Xuyabû ku hezkirinê pişta wê şikandiye. Jin jî ku ji dil hez dike, gava dimeşe, evîn li dewsa piyên wê şîn tê. Giya li ber lingên wê û bi gavavêtina wê re şîn tê. Heta di xewnan de, navê Şêxo li ser zimanê wê bû, lê niha di komarê de, bûye xanimek nû. Li ser keçik, jin û pîran digere. Di nav zindî û miriyan de, pirsa jinê û bindestiya wê dike:

- Eger ez ne jin bama, ez dîn nedibûm.

Nerînên wê, ne wek yê kesekî bûn. Xwedê ji jinan acizbû, ji loma ev bar danîne ser pişta wan. Hîndero tim digot; „Diya me Hawa, bavê me Adem ji ser rê bir û ya ku diya me Hawa ji ser rê bir mar bû. Ji ber vê, Xwedê ji du tiştan hez nekiriye jin û mar“.

Mirî bi ramanên Xanimê şa dibûn, lê Xanimê zû û bilez ramanên xwe diguhertin:

- Ji ber ku ez jin im.

Xwedê gelekî ji jinan hez kiriye. Nemaze yên xweşik. Lewra evqas şahî û xweşî xistiye gewdeyên wan. Dikeniya:

- Ax Şêxo, xweska te zanîba bê jin dema ku hez dike çi qasî kare bide.

Wê şevê, tariyê erd û ezman xwaribûn. Tenê, agirekî dîn bala zarokan kişandibû. Xanimê porê xwe dabû ber meqesan û xwe û porê jêkirî kiribû xwarina agirekî ku pirîskên wî li derûdora Şermola bitevayî belav dibûn. Dixwest xwe û Şermola bi hev re bişewitîne.

**EHMEDÊ DÎN**

Ti wezîr mîna wî kêfxweş nebûn. Çi tiştê ku di jiyanê de bidest neketibû, niha lê digeriya. Tenê keçika ku bi salan jê hezkiribû, destê xwe jê şuştibû û di hundirê wî de mabû hesreteke ji kevir. Çixare bêpere li miriyan digerandin. Bi wan re şev bi çixareyên vêketî dixemilandin:

-Bê çixare, dinya ne hêja ye perîkekê.

Bîranînên wî, ew dêşandin. Nemaze ew carên ku xelkê bi minet çixare didan dest wî:

- Bira ka çixarakê.

- Qey tu ji çixarê têr nabî?

Niha çixareyan li ber derî û pencereyan belav dike:

- Ez çi qas dixwazim ku xelk têr çixare vexwin.

Xweştirîn dem li cem wî ew bû ku çixara xwe sor bike û li

hêviya derketina keçikên dibistanan bimîne. Nemaze keçikên şanzde hijde salî:

- Di vî temenî de, agirê wan mirov dişewitîne.

Keçik kêmî şanzdan û zêdeyî bîstan nehêjane çixarakê. Kesin dibêjin ku keçik bi dû dînbûna Ehmed de ne. Her ji keçikekê hez dikir ku zêdeyî bîst salan dikir, li ber çavê wî reş dibû. Diçû yeke din. Hetanî ku rastî evîneke dijwar hat û wê evînê cendekê dilê wî li ber lingan rast kir. Piştî pênc sal hezkirin, keçikê ev bersiv dabû wî:

- Tu wek birayê min î.

Ehmed, geh dikeniya, geh jî digiriya. Piştî salekê nema karîbû, ne bikeniya, ne jî bigiriya. Mîna kêzikeke biçûçik ku di nav tevnên pîrepîrê de asê bimîne, Ehmed jî di nav tevnên evîna xwe ya têkçûyî asê mabû. Her û her ji keçikê hez dikir û di ber deriyê wan re diçû û dihat. Keçikê mêrek kir û berda û dîsa çavê xwe li yekî din digerand, lê hîna jî Ehmed bi dilê xwe lê dinêrî û keçikê ne bi dilê xwe, ne jî bi çavên xwe ew nedidît. Sînga Ehmed werimî, bi nexweşiyeke nenas ket. Çû cem bijîşkan:

- Nexweşiya te, ya dile. Vexwarina çixarê kêm bike.

Dilê wî, gav bi gav, diwerimî û rehên wî kêlîk bi kêlîk, zuha dibûn.

**REŞÎDÊ KAL**

Ji bo wî dîn li hevdu civiyan:

- ev ê rewşenbîr di nav me de çi dike?

- Ew jî ji miriyên Şermola ye.

- Ne dîn bû. Ev çima wekî dînan wisa bûye?

Reşîdê Kal li ber gora xwe rûniştibû. Bi çavên tijî hêsir li aliyê zindiyan dinêrî:

- Çi bela te ye?

- Ez, di rewşa van zindiyan de, diramim.

Şevekê ji xew rabû û axa Şermola bi ser serê xwe de dêra. Dînan jê pirsîn:

- Tu çima wisa dikî?

-Binerin min çi çand û ez çi diçinim? Herin bipirsin hûnê nas bikin.

Keserên Reşîdê Kal ji kûraniya dilê wî derdiketin. Zindana Dêrikê hat bîra wî, wisa jî reva dijwar û qiriktalî. Dewsa şivên cendirmeyan yên li ser destên jina wî Xatûnê hat bîra wî, pê re jî miçiqandina şîr di her du pêsîrên wê de. Mirina zarokê wî yê du mehî ji ber birçîbûnê. Fira hechecîkan li dorê û kevokên ku ew diparastin. Destnivîsa pirtûka wî ya ku bîst û yek salan di nav buxçika Xatûnê de veşartî mabû. Hêsiran zora wî birin. Girtîgehên Dêrikê, Tedmurê û Mezzê li ber çavên wî diçûn û dihatin. Işkenceya wan salan û libendemana bidarvekirinê, rewşa zindiyan anîn bîra wî. Her sibe û her êvar Reşîdê Kal xwe daqûl dikir û li jora çoga xwe dinêrî:

- Tifûû.. ev çi bû û te çi li dû xwe hişt.

Mirî lê diciviyan. Kêfa wan jê re dihat. Bîranînên wî li ser her zimanî bûn. Ji bakur heta başûr, gera bi piskilêt, şikandina lingê wî, sê rojên ku li ber germa tîrmehê bi koka darekê ve birçî û tî girêdayî mabû, gramera zimanê kurdî û dawiya dawî jî nexweşiya ku kezeba wî di girtîgehan de peritandibû. Mirî hem bi rewşa wî digiriyan, hem jî kêfxweş dibûn. Bi pirsên wan re ezman birûsk vedidan:

- Qey çi bûye? Çi li dû te ma ye?

Reşîdê Kal bi dilekî giran giran serê xwe dihejand:

- Ê zane zane û ê nizane baqê “bênamûsan e.”

Xwe dida ser gopalê xwe û tiliya xwe bi hêza xortekî bilind dikir:

- Ez ji wan re nahêlim. Ew heta qirikê di nav gunehê min de mane.

Miriyan li dînan dinêrîn. Dînan jî li hevdu dinêrîn. Pirseke sêwî, ji çavên tevdan diweşiya:

- Gelo Reşîdê Kal li ser kê dibêje?

Rewşa komarê hiştibû ku mirî û zindî vê pirsê û gelek pirsên din ji bîr bikin. Her yek bi karê xwe daketibû. Ti kes vala nemabû. Pêlên guherandin û tevger û lebatê erd û ezmanê Şermola dabûn ber xwe. Kêfa zindî û miriyan ji hev re dihat. Şer di nav wan de nema derdiket. Yekemîn car bû ku her tişt eşkere dibe û zindî têdigihêjin ku mirî ji wan çêtir dijîn. Bi derbasbûna yanzde mehan re çavên wan xweşik vebûbûn, lê destê wan di dilê wan de bû. Tirsê dirêj nekir. Bû rastî. Wê şevê, ji dilê tariyê, bi hezaran leşkerên cilreş, ne mirov bûn, ne jî lawir bûn, kişiyan. Bû qêrîna sofiyan:

- Qiyamet rabû... Qiyamet!

Na! Ne qiyamet bû. Tiştekî nêzîkî wê bû. Bi sedhezaran leşkerên cilreş ji laşê şevê herikîn. Mîna kurmik û maran xwe berdan nav malên zindiyan. Werîs li qirika Hîndero û Smaîlo û Şêxo gerandin. Ew bi darvekirin. Cendekên her sê dînan li ser girê Şermola, di nav çarçirayan de, li ba kirin. Zindî jî tar û mar bûn. Yek ji wan li ser lingan nehiştin. Ji wê rojê ve, li vî welatî, zindî xuyanî nakin. Heta niha dibêjin; ku nîvê xelkên Amûdê mirî ne û nîvê mayî jî dîn in.

## Çîroka Dawî

(Ya ku ji hemû çîrokan dirêjtir e)

P e r e